



Danerê Rojnameya pêşî a Kurdî  
Miqdad Mîhed Bedirxan

# Armanac

Hejmar, No: 128

Gulan  
May 1992

Buha - Price  
15 SKR, 3DM

Rojnameya Mehane

## Di dîroka Kurdistanê de rûpeleke zêrîn

✓ **Tevî eblûqaya eskerî û aborî ji aliyê Îraqê ve, tevî aciziyeye mezin ya Îran, Suriye û Tirkîyê û nebûna dezgehên ku dewletekê li ser piya digrin, Partiya Komunist a Îraqê û du rêxistinên Asûriyan ji tê de, bi beşdariya hemû partî û rêxistinên Kurdistanê Başûr, bi yek ji hilbijartinên herî demokratîk ya li herêmê, gelê Kurd him jî di dîroka xwe de, hem di dîroka gelên Rojhilata Navîn de rûpeleke nû vekir.**

Di Gulana 1992'an de li Kurdistanê Başûr, yek ji gelên Rojhilata Navîn; gelê Kurd yekem car e di dîroka xwe de bayê hilbi-

listik û dolabên dewletê, bêtî astengên li pêş propagandaya hilbijartinê, bêtî qontaxa çekên cendirman û zixta dezgehên dewletî, bi

Di 19'ê Gulanê de hem ji bo parlamentoyê, hem jî ji bo serokatiya Tevgera Kurdistanî hilbijartin çêbûn. Ji bo serokatiyê Mesud Barzanî, Celal Talabani, Osman Ebdulêzîz û Mehmûd Osman namzediya xwe danibûn û li gor Qanûna Hilbijartinê diviyabû namzedek ji bona ku bê hilbijartin % 50 zêdetir deng bigirta. Ji ber ku kesî % 50 zêdetir deng negirt, wê di 19'ê Tebaxê de cara duyem ji bo serokatiyê di navbera Mesud Barzanî û Celal Talabani de hilbijartin

çêbibe ku her duyan dengên herî zêde girtibûn û di 19'ê Tebaxê de kî jî kê zêdetir deng bigire, wê ew bibe serokê Tevgera Kurdistanî.

Her weha li gor beyanên Komîta Bilind a Hilbijartinê,

6 mehan piştî hilbijartinê, wê careke din ji bo parlamentoyê hilbijartin çêbibin.

### Encamên hilbijartinan

Di hilbijartina Parlamentoyê de 971.953 kesan deng dan. Ji van 967.229 rast, 4724 deng jî çewt hatibûn bi karanîn. Partiya Demokrat a Kurdistanê 437.879, Partiya Sosyalist û PASOK 24.882, Partiya Gel 9.903, Partiya Komunist (SK) 21.123, Tevgera Îslamî 49.108, Serbixwe 501, Yekîti Niştîman û Partiya Zehmetkêşan 423.833 deng girtin.

Di hilbijartina serokatiyê de 982.649 hilbijêran deng dan. Ji van 970.050 deng rast, 12.599 deng jî çewt hatin dan. Mesud Barzanî 466.819 deng, Celal Talabani 441.057, Osman Ebdulêzîz ku namzedê Tevgera Îslamî bû 38.865, Mahmûd Osman 23.309 deng girtin.

### S. Rêving

## Rewşen Bedirxan ji nav me koç kir



Ronakbîra Kurd Rewşen Bedirxan, destê siba 1'ê Hezîranê, li Sûriye, li bajarê Banyasê çû ser heqîya xwe. Li ser wesiya wê, cenazê wê anîn Şamê û bi beşdarbûna dora sêsed kesî, li goristana taxa Kurdan, li kêleka gora Celadet Bedirxan hat veşartin.

Rewşen Bedirxan, di 11.07.1909'an de, li bajarê Kayseriyê yê Tirkîyê hatiye dinê. Di 1915'an de ji ber hin sedemên siyasî bi bavê xwe Salih Bedirxan re hatiye Sûriyê û li Şamê bi cî bûye.

Xwendina xwe di sala 1924'an de, li dibistana mamosta (Dar-ul Muellîmat) qedandiye. Di 1925'an de ew diçe Urdunê û li bajarê Kerek du salan mudirtiya medresê dike. Di 1928 de vedigere Şamê, li dibistana El Ayik a Fransî de salekê mamostatiyê dike. Li hin dibistanên din jî mamostayî kiriyê, wek: Xewle Bintl Ezwer, Merwan û Leyl el Exiliyê.

Di 1934'an de, bû endama Komela Yekîtiya Jinan (Îttîhad Nîsaî). Di 1944'an de li ser navê jinên Sûriyê, li Kahîrê beşdarî Kongra Jinan ya Dinyayê bû.

Di 22.02.1935'an de bi lawê apê xwe Mîr Celadet Elî Bedirxan re zewicî. Di 1947'an de li radyoya Sûriyê, di beşa programa zarokan de bû spiker. Di 1974'an de teqawid bû û li Banyasê bi cih bû.


Berhemên wê yê çapkirî: Bîranînên Jinekê (werger, ji zimanê Tirkî bo Erebi-1951), Gerama ve Alamî (çîrok, ji Tirkî wergerandiye Erebi-1951), Bîranînên Mamostayekê (sê cild, ji Tirkî wergerandiye Erebi), Rûpelin ji edeba Kurdî-1954, Nama Gelê

Kurd (helbestên Goran ji Kurdî wergerandiye Erebi-1954). Di dûvre, Mektuba Celadet Bedirxan bo Mustafa Kemal (ji Tirkî wergerand Erebi). Berhemên Neçapkirî: Ji Bîranînên Jinekê (cilda du-duyan), Bavê Mîr Abdulhemîd (ji Tirkî wergerandiye Erebi), Wek min Celadet Nas kir (gotar, bi Erebi).

Rewşen Bedirxan dibêje: "36 sala, 1954'an heta nasîna min bi Dilawerê Zengî re, ez dûrî nivîskariyê ketim.

Gelek çîrok û semîner di radyoyan de belav kirine. Di gelek kongrên navnetewî de beşdar bûye. Wek nimûne, di kongra li dijî mêtîngkariyê li Yunanîstanê wek nûnera Kurdistanê beşdar bûye û gotarek xwendiyê û ji bo wê jî di kongreyê de, ew û danêre Partiya Baas, Mîşel Eflaq ketine gewriya hev. Her weha beşdarî kongra sisêyan ya Yekîtiya Jinên Kurdistanê jî bûye. Rewşen Bedirxan nivîskara jin a ewil e ku li ser jinên Kurd bi Kurmancî di Hawarê de nivîsiye. Rewşen Bedirxan ne tenê nivîskar û werger, her wisa bispora terbiyekirina zarokan jî bû. Rewşen Bedirxan jan û derdê gelê Kurd ji nêzik ve dinasî. Loma jî li ser pîrsa: "Tu pêşeroja tevgera rizgarîxwaz a Kurd çawa dibînî?", weha bersîv daye "Rewşa navnetewî ji Kurda re pirr xweş e, yekîtiya Kurda bide min, ezê Kurdistanê azad bidim te".

Rewşen Bedirxan di gel zimanê xwe yê zikmakî Tirkî, Erebi, Fransî, Îngilîzî û Almanî zanibû. Ew dayika lawek û du keçan bû.



jartinên azad û demokratîk tam kir û nûnerên xwe ji bo parlamentoya Kurdistanî hilbijartin.

Tevî eblûqaya eskerî û aborî ji aliyê Îraqê ve, tevî aciziyeye mezin ya Îran, Suriye û Tirkîyê û nebûna dezgehên ku dewletekê li ser piya digrin, Partiya Komunist a Îraqê û du rêxistinên Asûriyan ji tê de bi beşdariya tev partî û rêxistinên Kurdistanê Başûr, bi yek ji hilbijartinên herî demokratîk ya li herêmê, gelê Kurd him di dîroka xwe de, him di dîroka gelên Rojhilata Navîn de rûpeleke nû vekir.

Li gor raporên observatorên Îngilîz, Frensî, Elmanî, Swêdî û Norweçî, û nûçeyên rojnamevanên Rojavayî, tevî bê îmkanîyetan jî, hilbijartin pirr azad û demokratîk bûn û tu sextekariyek ciddî, yan bûyerên ku nedemokratîbûna hilbijartinan xuya bikin çênebûne. Cara pêşî hilbijêr li welatekî Rojhilata Navîn, bêtî

tememî bi îradeya xwe ya azad çûn dengên xwe dan û nûnerên yekem parlamentoya Kurdistanî hilbijartin. Asuriyên li Kurdistanê cara pêşî bi van hilbijartinan bi serbestî îmkana hilbijartinê nûnerên xwe bi dest xistin.

Li gor daxuyaniyên Komîta Bilind a Hilbijartinê, ji ber ku bajarên wek Kerkûk, Xaneqîn, Şingal, Mendelî û hinek cihên din hin jî di bin kontrola Îraqê de ne, Kurdên van bajarên û Turkmanên lê dijîn nekaribûn di hilbijartinan de deng bidin.

Piştî hilbijartinan tevî propagandayên Mehmûd Osman; nûnerê Partiya Sosyalist ku hinek kesan du cara deng dane, murekeba ku ji bo morkirinê bi kar hatiyê zû ji tiliya diçe, nûnerên parlamentoyên welatên rojavayî, rojnamevanên rojnameyên cihanî û beyanên Komîta Bilind a Hilbijartinê îddiyayên Mehmûd Osman bê bingeh bi nav kirin.

**Kesên ku ji bo endametiya Parlamentoyê hatine hilbijartin**

r. 11

**Reportajek bi berpirsiyarên Cepha Kurdistanê re**

**"Tu millet nikare bi xêratan bijî"**

r. 6-7

Rojeva Mehe

**Bêmîzaniya Tevgera Kurd**

Civaka Kurd di dîroka xwe ya têkoşîna bidestxistina maf û azadiyên milî de cara pêşîn e ku bi hebûna xwe ya hêzî ya tevgerî ewqas xurt û berfireh bûye. Li gor demên buhurî, îro potansiyeleke milî ya muezem peyda bûye. Lê ev hebûna milî ya berfireh di dîroka Kurdistanê Bakur de cara pêşîn e ku ji alî îdeolojî û perspektîfên siyasî yên milî ve bi bêmîzaniyek bêhed belengaz ketiye. Wek jîndarekî ku laş lê biwerime û mejî ber bi mehandinê ve diçe, tevger çiqas girs û berbelav dibe, pêre jî hebûna wê ya ramyarî ji alî bir û baweriyê de ber bi fikirtenikî, zelalnebûnî û stewriya perspektîfên siyasî de diçe.

Encama vê bêmîzaniyê ye ku erê îro li Tirkîyê pîrsa herî girîng û aktuel pîrsa Kurdî ye, erê agirê têkoşîn û hişyarbûnek Kurdbûyinê pêlên xwe gihandine hema hema her quncikekî welêt û pêtiyen vî agirî gur dibin, lê ya ku bala vê helkeftinê ber bi xwe ve dikêşîne, ne perspektîf û programên tevgera Kurdistanê ne ku bi zanebûn û hayjêbûnek milî hatibin amedekirin û pêşkêşkirin. Ne di warê avakirina statuyek giştî ya bingehîn de programeke xalzelalê diyar heye, ne taktîkên çareserkirina pîrsên rojane û yên pêşdestxistina tevgerê yên gavbigav xwiya dibin, ne jî tevger bûye xwediya wan wasite û muesesên rêxistinî yên lazim ku di jiyana siyasî û civakî de xwe pêş de bibe. Ji aliyekî tevgerê berbelav peyda bûye ku hereketê bes di hereketê de dibîne, hebûn û mayîna xwe ya di rojevê de di ser her tiştî re digire; serê wê bi vê yekê gêj bûye, ne ew bi xwe bîra muhawela rênîşandana çareserkerinê pîrsên rojevê û yên dîrûdirêj dike, ne jî tehamul dike ku di vî warî de fikir bîn zelalkirin û gav bîn avêtin.

Ronakbîrên Kurd ji aliyekî de belawela ne, ji mueseşe û wasitên xwediarkirinê bêpar in. Hin ji wan li derveyî welêt mahkûmê jiyana sirgûniyê bûne, heke zanîn û tecrûbeyek wan heta dereceyekê hebe jî, hêz û îmkanê xwe ya ku wê zanîn û tecrûba xwe bi awakî xurtî pêşberî tevgera gelêrî ya milî bikin, ji dest xwe berdane. Her ku diçe bêînsiyatîf dibin, her ku diçe ji civakê dûr dakevin.

Li hundirê welêt dubendî û tenegehîstînek di navbera ronakbîrên neslê nuh û yên kevn de ava bûye. Neslê kevn tevî kurmê xwe yê dema xweinkarkirina milî daketiye qadê. Qada îro hin çirûskên ronahiyê di mejiyê wî de pêxistiye, lê ne mejî ne jî dilê wî tîr ronahî dîtiye; hergav dudil e, bêistîkrar e, hê jî cesareta medenî di ruhê xwe de venejandiye. Kurtbînî, xweperest dijayetiyên şexsî û herêmî hê bi tevayî ji ser xwe ranekiriye. Newêre mewqîfê milî yê medenî û muasir a ji bo rêka milletê xwe ji xwe re bike asêgeh û di wî mewqîfî de musir be. Heke piyekî ber bi mewqîfê milî de bavêje, du piyan ber bi mewqîfê xweinkarkirina milî yan jî xweperestiya şexsî û herêmî de davêje. Neslê nuh ji neslê kevn fam nake, zêde tiştêkî di tercube, zanîn û xususiyetên wî de nabîne ku ji xwe re bike bingeh. Lê wî bi xwe jî bingehê ku xwe li ser ava bike, nedîtiye. Neslê nuh ji wê zanîna neslê kevin a ku rehên xwe beradê, bêpar maye. Bi vê bêpariyê ji aliyekî de teqereq û tozûdûmana roja îroyîn ew gêj kiriye, qeyd û bendek li dora mejiyê wî yê serbestfikirinê rapêçaye, ji aliyê din îdeolojiya radikalîzma çepê Tirkîyan (ku ev îdeolojî di nav civaka Tirk de marjînal maye, heta civakê ew avêtiye derveyî xwe) kiriye heyvanê birûbawerîya xwe, ya cihana xwe.

Bi hemû van alî û xususiyetên xwe ve, ronakbîriya civaka Kurd di serê laşê tevgera Kurd ya girsûbûyî de bûye wek mejiyekî bê şûr.

Loma jî çî di bûyerên rojane de çî di perspektîfên dîrûdirêj ên giştî de şûr û hayjêbûna tevgera Kurdî bi xwe rê li ber xwe venake, bi dewlet û hukumeta xwe, bi partiyên xwe yên rast û çep, bi esker û siyasîyên xwe û bi ronakbîrên xwe ve îdeolojiya Tirkîyê, bala tevgera Kurd bi vî alî wî alî de li ba dike. Tevger rojane dijî, Tirk bayî (bê) bi kîjan alî ve hildikin berê wê jî bi wir de dikeve. Ya xerab, ji ber toz û dûmana ji gelek aliyên ve hilkirî, kême kesên me hay ji vê rewşa me ya trajîk heye. Kême kesên me difikirin ku ka ev çî hale em tê de ne, em bi ku ve diçin, encama vê rêveçûna bêserûber wê bibe çî? Yên ku difikirin jî di dilê xwe de difikirin. Hê kes ranebûye bi dengê bilind ev rastî diyar nekiriye.

Lê divê êdî dûmahika vê rêveçûnê xwiya bibe, ronakbîrên tevgera Kurd divê li xwe varqilin, ji bo çareserkirina vê nexweşiya giran li rê û dirban bigerin, vî derdî derman bikin.

**NELSON MANDELA:**

**"Xwe têxin şûna Kurdan wê gavê hûnê fahm bikin ku ez çî dibêjim"**

Çima ku serokê ANC Nelson Mandela xelata Aştiyê ya Ataturk red kir; li Tirkîyê qiyamet qewimî. Serokên partiyên siyasî yên Tirkîyê û bi taybetî jî rojnamevanên Tirk li dijî Mandela agir ji devê wan barî. Hin rojnamevan ji Mandela re gotin; "yamyam, reşikê bi qiloç, tazî û belangaz". Rojnama Hurriyetê di rûpela xwe ya pêşîn de bi pûntên mezin nivîsand "Afrikiyî pîsik". Rojnama Milliyet li ser Mandela bi navê rûbrîka "Dinya Mandela ya Reş" xebereke magazinî çêkir. Tê de tîkiliyê jina Mandela bi kesên din re eşkere dikir û ji bo Nelson Mandela jî dinivîsand ku ew qatîlê polis e. Bedrî Koraman di karikatûra xwe ya di rojnama Milliyetê de, Mandela wek yamyam nişan dida û ew wek "yamyam" xelata Ataturk dixwe. Welhasil bi rojan rojnamevanên Tirkîyê li dijî Mandela qampanyeke qirêj ajotin.

Ji serokên partiyên, reaksiyona herî çavsor û şoven ji serokê DSP (Partiya Çep a Demokratîk) Bulent Ecevit hat. Ecevit ji redkirina xelata Ataturk wisa aciz bûbû ku digot; divê dezgeha ku xelata Aştiyê ya Ataturk daye Mandela bê girtin û ew kes bîn cezakirin.


Him li gor radyoya BBC û him jî li gor beyana ANC, Nelson Mandela ji ber zor û zulma ku li Kurdan tê kirin û îhlalkirina mafên mirovî li Tirkîyê, xelata Ataturk qebûl nekiriye. Ji alî din li gor ajansa Reuter, Mandela sebaba redkirina xelata Aştiyê ya Ataturk wiha gotiyê; "Xwe têxin şûna Kurdan, wê gavê hûnê fahm bikin ku ez çî dibêjim."

Di serdana xwe ya Swêdê de ji Nelson Mandela li ser pîrsa çima ku wî Xelata Aştiyê ya Ataturk redkiriye, got ku; "em wek rêxistin, rêxistîneke gelerî ne, em guh didin gelê xwe ji ber wê jî nedibû ez xelatê qebûl bikim".

Wek tê zanîn piştî derbeya 12'ê Îlonê generalên Tirk bi navê Ataturk gelek dezgeh û komîte avakirin. Yek ji wan jî, Komîta Xelata Aştiyê ya Ataturk e. Di vê komîtê de Serokwezîr, Serokê Erkanî Herb, hin wezîr, serokê Dezgeha Bilind ya Ziman û Kultur û Tarîx ya Ataturk û gelek profesor cî digrin.

Xelata Aştiyê ya Ataturk heta nuha dane van kesên jêr;

Di 1986'an de serokê NATO'yê kevn Josph Luns, di 1987'an de Serokomarê Almanya Federal Richard Von Wizaacker, di



1989'an de Qralê Japonyayê Takahito Mikasa, di 1990'de Serokê Cunta 12'ê Îlonê Kenan Evren û ya îsal jî dan Serokê ANC Nelson Mandela. Di salên 1988 û 1991'î de Komîta Xelata Ataturk ji vê xelatî kes neditin.

Gava meriv li wan kesên ku Xelata Aştiyê ya Ataturk girtine dinêre, meriv bi hêsanî fam dike ku Mandela çima xelat qebûl nekiriye. Kesên ku êrişî Mandela dikin û nav û niçokên nemayî lê dikin di eslê xwe de Cunta 12'ê

Îlonê diparêzin û zora li ser Kurdan jî tecil dikin.

Mandela li dijî nijadperestiyê, zorê û neheqiyê bi salan di hefsan de li ber xwe daye û ji bo ku wî aştî, dostî û hevkarî parastîye, ew qehremanê hemdemî yê insanetiyê ye. Wî bi redkirina xelata "Aştiyê ya Ataturk" ne tenê dilê gelê Kurd şah kir herwisa wî wezîfa xwe ya însanî jî bi cî anî.

Lewend Firat

**Hejmara Kurdên Ermenîstanê ji 56 hezaran daket 4 hezaran!!!**

Di 1989'an de li Komara Ermenîstanê hejmartina giştî çêbû. Li gor vê hejmartinê, li Ermenîstanê 56 hezar Kurd hene. Lê paşê dan diyarkirin ku ji vî 56 hezarî 52 hezar kes ne Kurd in, Yezidî ne, tenê 4 hezar ji wan Kurd in. Vê yekê ji me re tiştêkî nuh da diyarkirin ku bi navê Yezidiyan milletekî nuh hat afirandin.

Îcar ger em li gor vê îstatîstîka hukûmata Ermenîstanê biçin, rojnama Riya Teze ku ji 1930'yî û vir de ye derdikeve, divê ku tekeve kitêba Ginnes a rekoran. Çimkî ji "çar hezar" Kurdên Komara Ermenîstanê, sê hezar kes aboneyên Riya Teze ne.

Li vê derê ez dixwazim tiştêkî din jî bidim diyarkirin ku ev serê çend mehan e, ji ber problemên aborî, rojnama Riya Teze nikare derkeve.

Têmûrê Xelîl

**Armanc**  
Rojnama Kurdî ya mehane  
Monthly Kurdish Magazine  
**Redaksiyon:**  
M. Elî  
Zinarê Xamo  
Hesen Mizgîn  
Mîrza Bextiyar  
Lewend Firat  
S. Rêving  
M. Lewendî  
**Redaktorê berpirsyar:**  
M. Elî  
**Berpirsyarê beşê**  
**Dimilkî:** Malmîsanîj

**Adres :**  
Box: 152 16  
161 15 Bromma  
Sweden  
**Telefon**  
46-8-803135  
**Telefax:**  
46-8-801825  
**Ansvarigutgivare:**  
Kurdiska  
Demokratiska  
Arbatar Unionen  
Postgiro: 50 37 99-9  
ISSN: 0348 7385

**Abonetî**  
**Prenumeration**  
Abonetîya Salekê  
Li Skandinaviya  
150 SKR  
Meqam  
Myndigheter  
250 SKR  
Li Ewropa  
50 DM  
Li derveyî Ewropa  
40 \$  
**Anons/ilan**  
niv rûpel/ en halvsidan  
2500 SKR

# Rêxistina Rewşenbîrên Kurd li Ermenistanê

Guherandinên mezin li Sovyeta kevn û Ermenistanê bûn sebeb ku rewşenbîrên Kurd li Ermenistanê dezgehên xwe ava bikin û ji gelê xwe re bibin nûner û alîkar.

Ji bo vê armancê di rojnama Riya Teze de bi beşdarbûna zana û ronakbîrên Kurd civînek çêbû. Civîn ji alî berpirsiyarê rojnama Riya Taze **Emerîkê Serdar** ve hat vekirin. Wî di axaftina xwe de armanca civînê wiha eşkere kir, "armanca civînê helkirina problemên netewî û çandî yê Kurdên Erme-

nistanê ye. Û armancek din ew e ku serokatiya Komara Ermenistanê înfomasyonê rast di derheqê me de bistîne, yanî ew rêxistina ku em dadimezirînin pêwîst e bibe nûnerê Kurdên Ermenistanê."


Piştî axaftin û munaqeseyan ji bo serokatiyê û Komîta rêvebir hilbijartin çêbû. Prof. Şakîrê Xudo Mihoyî (serok), Şerefê Eşîr (cîgir), Çerkezê Reş (cîgir), Temûrê Xelîl (sekreter), Emerîkê Serdar, Karlanê Çaçanî, Tosînê Reşîd, Eskerê Boyik, Babayê Keleş,

Kinyazê Hemîd û Aslîka Qadir ji wek endam hatin hilbijartin.

Ew kes jî hatine bijartinê wek nûnerên ji gundê Kurda. Sûtoyê Feyzo (ji gundê Şamîramê), Zurbê Emir (ji Armavîrê), Temûrê Mîro (ji Ecmîazîne), Paşayê Efo (ji Talînê), Rêzoyê Ūsîb (ji Aragasê)

Dawiyê biryar hate girtin ku qanûnname rêxistinê bê amade kirin û pêşkêşî Wezareta Adaletê ya Ermenistanê bibe da ku rêxistin bi qanûnî bê testîqirin. □

## Ferhengoka Terîmên Huqûqî



Ferhengoka terîmên huqûqî ya bi zimanê Swêdî û Kurdî (Kurmançî) piştî xebateke dûr û dirêj temam bû.

Armanca çêkirina vê ferhengokê ew e ku di zimanê hiqûqa rojane de tercuman û kesên Kurd bi-

karibin terîm û peyvên huqûqî bi kar bînin.

Beşdarên Kurd ên vê xebatê jî hemû beşên Kurdistanê bûn.

Di pêşgotina vê ferhengokê de mamoste Reşo Zîlan bi kurtî weha dinivîse: "Em Kurd hewceyî

hemû cûre ferhengokên termolojî û ferhengan in. Hejmarek gelek hindik ji Kurdan zimanekî biyanî dizanin. Ew tenê dikarin bi alîkariya ferhengên biyanî û hewceya xwe bi cih bînin. Kurdistan û milletê Kurd ne serbixwe ye, zimanekî yekgirtî yê edebî yê Kurdî bi başî pêk nehatiye. Ji ber wê jî di vê xebatê de gelek dijwarî derketin pêş me".

Di destpêka karên wisa de çewtî û kêmasî çêdibin. Lê rastîyek heye, divê em Kurd ji derekê dest bi xebatên weha giranbuha bikin. Ev xebat bi tevkarîya Enstutiya Werger û Tercumanîyê ya Universîta Stockholmê, Enstutiya Bakur û Mekteba Bilind a Bîskops-Arnô û Federasyona Komeleên Kurdistanê Li Swêdê hatiye amade kirin.


Şoreş Zîrek

## Mehmed Uzun ket Komîta Rêvebir ya Yekîtiya Nivîskarên Swêdê

Di kongra xwe ya di 9'ê Gulanê de Yekîtiya Nivîskarên Swêdê, nivîskar Mehmed Uzun jî hilbijart ji bo Komîta Rêvebirinê. M. Uzun wê heta sala 1994'an ve wezîfa xwe bidomîne. Mehmed Uzun di 1987'an de bûye endamê Yekîtiyê.

Mehmed Uzun ji sala 1977'an û vir ve li Swêdê dijî û heta nuha çar romanên bi Kurdî nivîsandine.

Berê jî nivîskar Mahmûd Baksî di Komîta Rêvebirana Nivîskarê Swêdê de cî girtibû.



### TEKZÎB

## Bavê Nazê bûyer ne wek jê re hatiye gotin lê wek ku xwestiye nivîsandiye

Hevalên delal;

Di hejmara Armançê ya 123'an da bi semivîsa "Sê wêne ji sala buhurî" nivîsêke Bavê Nazê hat weşandin. Gotinên Bavê Nazê giran in, bédengmana min wê qebûlkirina naveroka nivîsa wî be. Xwendevanan nivîsa Bavê Nazê xwend. Heqê min e îcar jî ez xwe biparêzim.

Bêguman di vê meselê da pêwîst bû her du alî û pê re der û dorên bi meselê ve girêdayî bihata guhdarkirin. Ev rastîyek pirr basît e. Ji bo ku meriv bikaribe vê rastîya biçûk bizan e, ne pêwîst e di emrê Bavê Nazê de be. Bes ew wer nake.

Ew dinivîse: "Tevî ku min bi çavên xwe nedîtîye...." Mirov tiştên wiha bi çavên xwe nabîne. Dibihîze. Guhdar dike. Ew vekirî nikane bêje: "Tevî ku min li Serdar guhdar nekiriye". Ger wiha gotiba wê xwe bida dest. Bes lîstika bi gotinan dîsa wî xelas nake. Bavê Nazê, bê ku tu li Serdar guhdarî bikî, çawa tu dikanî gotinên wiha giran bi kar bîni, wî, "bêbext" û "rûreş" bikî?

Xuya dike Bavê Nazê bûyer ne wek jê re hatiye gotin, lê wek ku xwestiye nivîsandiye. Pere ji oda min hat dizîn. Axaftina bi du kesên ku min şik ji wan dikir, bê neftîce ma. Gava min, ew kesê ku Bavê Nazê dibêje "gunehkar" kir min jê re got: "Heger pere nehat dîtîn, ezê xeberê bidim polîs". Bersîva wî, "emê hevûdu li kuçê bibînin" bû. Ma li kuçê wê çî rê min bida?

Çûyina ba polîs pê ne xweş bû. Şik dibir ser xwe. Nama ku Bavê Nazê qal dike min jê re nivîsand û pişt re jî xeber da polîs.

"Şik" û "tuhme xist hustu" du gotinên cûda ne. Heqê min û yê her kesî yê şikê heye. Bes heta sedî-sed îspat tunebe, "tuhme xist hustu" bêbextî ye. Min tenê xeber daye polîs ku pere hatiye dizîn. Ev jî heqê min e. Ne wek Bavê Nazê nivîsiye "tuhme xist hustuyê hevalê xwe". Li cem wî kesî min ji polîs re got "diz kî ye ez nizanîm". Çar kes şahid in û sax in. Heger Bavê Nazê bi yek kesî re axîfiba ew nivîs nedinivîsand.

Serdar Dicle

## NEYNİK

### Rewşa Zimanê Kurdî û Yekîtiya Zimên

L. Bansûr / Aydın

Îro li her çar perçên Kurdistanê jî livînek ciddî tê dîtîn û mirov dikare bibije ku ev livîn merheleyeke "qonaxa rizgariyê" ya tebîî ye.

Di vê merhelê de wezîfeyên mezin dikeve ser milê hemû Kurdan. Lê bê şik wezîfa herî mezin dikeve ser milê ronakbîrên Kurd.

Ziman, ku şertê miletbûnê yê esasî tê hesabandin, heger gotin eyb nebe rojên xwe yê herî bê ser û ber dijî. Ew gelê Kurdê ku heta îro têkoşîna huwîyeta xwe dide, çî heft ku ehemiyeteke girîng nedaye zimanê Kurdî. Netîce, di qonaxa îro de zimanê Kurdî -heta mubalexe be jî- bi hovîti tê qetilkirin. Ronakbîrên Kurd ên ku ji serê sedsalan ve ji bo ziman û kultura gelê xwe, ne bi zimanê diya xwe, lê bi zimanê hêza serdest têkoşînê dide, di eserên ku îro bi Kurdî derdixê ortê de jana ve kêmasiyê dikşîne.

Zimanê me jî ber asimîlasyona Erebi, Farisî û Tirkî birînin mezin girtiye. Mirovên me yê ku zaraveyên cihê dipeyivin di axaftina jiyana rojane de ji bo jî hev têgihîştinê dijwariyê dikşînin. Îcar, bêmesûliyetiya ronakbîrên Kurd jî lê zêde bibe wê gavê bi hêsayî mezinbûna tahlukê tê dîtîn.

Li Kurdistanê jî weşanên Kurdî re bîriyek (hesretek) mezin heye. Lê ew kitêb, kovar û rojnameyên bi Kurdî derdikevin, tije kêmasî û çewtî ne. Nivîskarên ku van weşanan derdixin bêguman ronakbîrên hêja ne û dil dane tevgera milî. Ez van aliyê wan li li dervayî munaqesê dihêlim û dixwazim di kitêb, kovar, ferheng û gramerên ku heta nuha weşandine de li ser unsûrên muhîm ên ku bala meriv dikşînin, rawestim. Wex şexs naxwazim tu şexs ya jî dezgehê jî xwe re bikim hedef. Lê belê dixwazim diyar bikim ku ji bo "yekîtiya zimanê Kurdî" hewcedariya munaqeseyêke wiha heye.

Ronakbîrê Kurd çî kiriyê? Ronakbîrê Kurd bêtî ku haya wî jê hebe çî zirar daye zimanê Kurdî? Bêtî ku li biçûkî ya jî li mezinaiya van ziraran bête nêrin kîjan xebat esas hatine stendin? Em dikarin di pênc noqtên esasî de li bersîvan bigerin.

1- Nivîskarên me dema eserên xwe bi Kurdî dinivîsin gotinên ku maneya wan nizanin, bêtî ku li herêmên din li hemberiya wan bigerin, berê xwe didin gotinên Tirkî, Farisî û Erebi. Vê negatîvîyê mirov dikare bi hêsayî di berheman de bimîne. Wek numûne, di kitêba Kela Dimdim de gotinên Farisî "bihar, destan, fedekarî, millet, kîn, di kitêba çîrokên Kurdî de "edebiyat, feyde, sîlah" û hwd.

2- Hin nivîskarên ku bi tesîra asimîlasyonê erîzyona di zimên de fahm nakin, ew gotinên ku maneyên wan yek in, heta ku em hîn jî bi pêş de herin navên xusûsî bi şiklên cihê dinivîsin. Gava meriv bixwaze numûne bide navê şairê mezin Cegerxwîn di qapaxa kitêba Kîme Ez de ku jî alî weşanxana Pelê Sor ve hatiye weşandin wek Cigerxwîn hatiye nivîsandin. Di qapaxa kitêba Lenin Şafağî ya ku jî alî weşanxana Kaynak ve hatiye weşandin de jî îcar bûye Cigerhun. Cardin di Ferhenga Mûsa Anter de li hember gotina "hastane" nexweşxane hatiye nivîsandin, lê di hejmara 3'an a kovara Nevrozê de wek nexweşgeh cih girtiye. Di hejmara 14'an a kovara Welat de jî "asker" re esker hatiye gotin, lê di Ferhenga Mûsa Anter de serbaz tê gotin.

3- Hin nivîskarên me devokên herêmên xwe esas girtine û îmze avêtine bin gelek berhemên muhîm. Mesela, ferhengêke ku ji nivê gotinên wê bêtîr bi Tirkî ne bi salan jî însanên me re bûye çavkanî.

4- Li ruyê dinyayê bi kîjan zimanî tê nivîsandin bila bê nivîsandin, navên xusûsî nikarin bîn guherandin. Fena ku telafûz dibin, nayên nivîsandin. Meriv nikane bibêje ku nivîskarên me li vê yekê miqate ne. Mûsa Anter di Ferhenga xwe de li hember navê Kurdistanê kevin Madya nivîsiye, lê kovarek wî navî wek Medya bi kar tîne.

5-Bi taybetî divê meriv îro gramer û ferhengan bigre dest. Ji bo yekî ku nuh rastî zimanê nivîskî dibe, gramer û ferheng kitêbên gelek muhîm in û ew jî gelek şaşî îhtîwa dikin.

### Pêşniyarên çareserkirinê

Ji bo ku zimanê Kurdî bibe zimanekî milî û li ser esasên saxlem bi cî bibe, bêtî ku wext derbas bibe yekîtiyêke ziman ji bo her çar perçeyan şert e. Di du qonaxan de bi cih hatina vê yekê wê welê bike ku pêvajoya yekîtiya ziman, kultur û folklorê kêmjan derbas bibe. Berî her tiştî divê li her perçeyî bi beşdarbûna ronakbîrên Kurd veqî û enstîtu bîn danîn.

Di qonaxa duyem de divê di gel ronakbîrên Kurd ên Kurdistanê Îran, Iraq û Suriyê bê rûniştin û xebat bê kirin ku li ser bingehên qayim dezgeha zimanê Kurdî bê avakirin.

Ez naxwazim bibêjim ev tiştên hêsan in. Her dewleteke nuh ava dibe raberî van gelşan dibe, di nav demeke wek 3-4 salan de ne mumkûn e ku ev gelşan çareser bibin. Lê heger em ji îro ve pêşî li ber vê yekê negrin, her ku here wê problem mezintir bibin. Û mesûliyetê wê jî li ser milên ronakbîrên Kurd e.

## RAMANÊN RAMANWERAN

# Ma avakirina partiya legal a Kurd paşverûti ye?

Sait Aydogmuş

Berpirsiyarên Partiya HEP'ê û parlamenterên ku li ser navê ve partiye ji listeya SHP'ê hatin hilbijartin û dawiyê jî jê istifa kirin, li ser avakirina partiya legal a Kurd dibêjin ku avakirina partiye legal ên Kurd, ji ber ku "partiyeye weha wê li ser bingehê irq û miliyetê ava bibe û wê berê xwe bide mirovên herêmeke cografi a sinorkirî, lewra jî karekî weha helwestekî (mewqifekî) paşverû a politîk e" û gaveke weha wê "ji fêdê zêdetir, zerarê bigihîne gelê deverê".

Weşanên resmî û ne resmî yên PKK jî bêyî ku bi peyvekê jî rexne lê bigrin, bi tundî dibêjin ku "Partiya legal a Kurd ji bo pêşî lêgirtina têkoşîna PKK, ji aliyê împeryalizm û kolonyalîstan ve tê daxwazkirin û em rê nadin ve yekê".

Eger propagandayên weşanên resmî û ne resmî yên PKK ji bo "Platforma Demokratîk a Nû" ya ku ji aliyê kesên HEP'ê ve xebata wê tê kirin û hatiye îlankirin ku wê ji Kurd û Tirkan pêk bê, di gel çerçeweya li jor bê fikirin, wê nêzîkiya PKK ji bo ve nêrînê bê dîtin.

Eger bala we bixşîne, bingehê xuya yê dijîtiya HEP û PKK'ê li hember partiya legal ne li ser legalbûn, yan li ser politîkaya partiya legal e, lê ji ber ku partiyeke weha wê piştî xwe bide bingehê netewî, anku ew "Partiya Kurd" be. Bi ser de ev sedemê bingehîn, şûna welat û netewe, bi peyvên "irq", "miliyet", "herêma cografi" ku bi salan in kolonyalîstan guhên me pê teqandine, tê îzahkirin û bi vî awayî jî dikevin davikên kolonyalîstan.

## Munaqêşa vala

Kurd ne "irq", yan "miliyet" in, neteweyekî bi serê xwe ne, neku li "herêmeke cografi" ya welatekî din, lê li welatê xwe dijîn, mafê wan ê herî tebîî ye ku ew jî wek her neteweyekî di qada navnetewî de cihê xwe bigrin û ji bona ve jî partiyên politîk jî tê de divê dezgehên xwe yên netewî deynin, munaqêşeya wan tiştan -nemaze di gel Kurdan- êdî berredayî û vala ye.

Îro hêzên rizgarixwaziya netewî di vî warî de gavên mezin avêtine. Hestê (şuura) netewî bi sur'et pêl dide, ber bi netewebûnê ve bi lez tê meşîn, gelê me bi hemû sinif û tebeqeyên xwe yên alîgirên rizgariya netewî ve huwiyeta xwe ya netewî diçespîne û ber bi serketinê ve diçe.

Lewra jî politîkaya resmî ya ku hebûna pîrsa Kurd ji binî înkâr dikir, iflas dibe û kolonyalîst ji bona ku pêşî li pêşveçûnan bigrin, dixebitin ku politîkayekê nû bifirînin. Wek tê zanîn li gor ve politîkaya resmî a nû pîrsa Kurd ne pîrsa netewe, yan kêmeneteweyekî ye, lê "pîrsa huwiyeteke kulturî ye ku mozayîka netewî a Tirkan dixemilîne, zengîn dibe."

Ji bona cîgirtina ve nêrînê jî kolonyalîstên Tirk di qada netewî û navnetewî de her tiştî dikin.

Di warê asîmilasyona netewî, di warê berlêgirtina qonaxa netewebûna me de kî xizmeta politîkaya sexte a kolonyalîstên Tirk dike? Aliyên ku dibêjin qazanc û mewziyên di îlegalîteyê de hatine bi destxistin, bi xebata legal we-rin bi hêzkirin, yan aliyan ku xwe cihê birêxistina ku tevgera Kurd bi pratîka xwe ya heta îro û bi qonaxa ku îro tê de ye, bi çepê Tirk jî daye qebûl kirin, tûnin ortê?

## Siyaseta dewletê

Eşkere ye ku dîtin û keftelef-tên kesên HEP'ê li gor çerçeweya plan û xebata kolonyalîstan in. Tê zanîn ku ne rêberên berê û ne jî rêber û hin parlamenterên nuha HEP'ê yê nuha ji zemîneke ku xebata Kurdî dikirin, yan ji tevgera Kurd ku rêxistinîya cihê diparast, nayên. Her weha girîngiya rola Ozal ya di avakirina HEP'ê de tê zanîn. Piştî hin bûyer û diyardeyan xuya bûye ku rola wî ne ji bo "perçekirina dengên SHP", lê pêşîlêgirtina avakirina partiyeke legal a Kurd bû ku daxwazekê politîkaya resmî a dewletê bû. Serokê SHP Erdal Inonu gelek caran daye xuyakirin ku itîfaqa wan a bi HEP'ê re bi armanca ku tevgera "seperatîst" bi hêz nekeve, bûye, ev itîfaq li gor politîkaya dewletê bûye û di vî warî de jî bi ser ketine.

Tevî ve armanca dewleta kolonyalîst û ya partiyên wan, ji ber ku tevgera netewî a Kurd bi gavên mezin ber bi pêş ve çû û zor da "tengiya" diwarên îlegalîteyê, lewra jî demekê HEP'ê potansiyel li dor xwe civand, di fiiliyatê de bû partiyeke legal a Kurd, di xebata yekitiya netewî de jî bû sembolek.

Hîn ji destpêkê hukûmeta koalîsyonê bi gotin û programa xwe eşkere dabû nîşan dan ku wezîfa bingehîn a wê ew e ku tevgera "seperatîst" û beşê wê yê çekdar ji ortê rake. HEP û lewra jî PKK bi îsrarî piştigiriya ve hukûmetê kirin û di vî warî de bûn nimûnên aletbûna politîkaya resmî a dewletê. Dîtinên HEP'ê yên li ser mesela partiya legal diyar dibe ku îstîfaya hin parlamenteran ji SHP'ê û qutkirina piştigiriya koalîsyonê mîsyon ne-guherandiye.

Baş e çawa dibe, PKK ya kesên ku xwe cihê rêxistinê qebûl nakin "xayîn", "kirêgirtî", îlan dibe û li dijî kolonyalîstên heta îro jî şerê çekdar didomîne, piştigiriya ve politîkayê dike, ew politîkaya ku di legalîte de xwe cihê rêxistinê bi "regezperestiyê" bi nav dike, li pêşiya netewebûnê dibe asteng, û dibe alekî siyaseta entegrasyonê a dewletê?

Çend sedemên ve yekê hene ku ezê di ve nivîsa kin de nekarim zêde vekim, lê îşaret bikim.

Ya yekem Kurdistanîbûna perspektîfa politîk a PKK ji destpêkê heta îro seqet e. Di beyanên Apo yên di van salên dawî de ku dibêje "Em daxwaza erd nakin", û pîrî

caran yek dewlet û yekitiyê dide pêş û îlan dike ku "Soreşa Tirkîyê jî li ser milên wan e", ve seqetiyê xuya dikin.

## Pragmatîzm

Ya duyem PKK ji bona ku xwe wek netewe dibîne, ji ber ku di pratîkê de dixwaze temsîla tev sinif û tebeqeyên netewî bike, dikare kirasê îdeolojîk ê komunîzm, dîndarî û miliyetçîtiyê li xwe ke, lewra jî rêxistinêke pir pragmatîst e. Wekî tê zanîn pragmatîzm li şûna prensîbên daîmî, menfeetên xwe yên rojane dike prensîp. Ji ber wê jî ji bo PKK tiştê herî muhîm bi navê Kurdan avakirina tekelên politîk û berdevamkirina wê ye. Û ji bo wan ne muhîme ve yekê bi kê re û bi çi awayî dikin. Danûstendinên PKK û HEP'ê pir nêzî ve dîtinê ne.

Ya siyem, babetek e ku PKK di vir de bi heq e. Wek tê zanîn, hin aliyan ku "partiya legal a Kurd" rast dibînin, şûna ku piştigiriya têkoşîna çekdar ya ku di pêşketina tevgera rizgarixwaz a netewî de xwedî cihêkî giring e, bikin, wê wek kolonyalîstan bi "terorîzm"ê bi nav dikin. Hinek alî hîn zêdetir jî diçin, têkoşîna çekdar, hetta xebata îlegal "xeyrî meşrû" îlan dikin.

Piştigiriya têkoşîna çekdarî nekirin û ew meşrû nedîtin, du tiştên pîr cihê ne. Ferqeke biçûk, lê pîr giring di navbera wan de heye. Di hinek rewşan de mirov dikare ve ferqê bişibîne ve meselê: ferqa di navbera nexwestina berdanê, yan meşrû nedîtinê mafê berdanê de.

Di vî warî de ez dixwazim nimûneyeke pir bi rûmet bidim. Nelson Mandela yê ku bi qebûlnekirina "Xelata Aştî a Atatürk" riyakariya kolonyalîstên Tirk li pêş çavên cihanê eşkere kir, dema ku di zîndanê de bû, dewletê jê re digot bi tenê îmze bike ku "şiddet bikaranîn ji bo reşikan ne meşrû ye", em ê te berdî. Lê wî got ku li cihê şiddet hukûm bike, şiddeta li dij wê, çi bê kirin, çi neyê kirin, mafekî bingehîn e û ev yek jî bû sebeb ku bi salan di zîndanê de ma. Ew bi ve helwesta xwe ya bi rûmet li seranserî cihanê bû qehremanê azadiyê.

Ez têkoşîna çekdar rast dibînim, lê PKK wê fetîşe dike û digihîne encama ku "kesê ku têkoşîna çekdar rast nebîne xayîn e", çewtiyek e. Çewtiyeke din jî têkoşîna çekdar meşrû nedîtin e, wê bi "terorîzm" bi nav kirin e.

Partiyeye legal a Kurd eger li ser bingehê dijîtiya şerê çekdar û meşrû nedîtinê xebata îlegal, ava bibe, wê têkoşîna rizgariya netewî zeif bike û ev jî xizmeta emperyalîzm û kolonyalîstan e. Lewra motivasyona PKK ya li dijî "Partiya Legal a Kurd" ne bê sebeb e.

Bi kurtî bê gotin, divê tevgera netewî a Kurd di legalîteyê de jî partiyên xwe ava bike. Mesela ku em munaqêşe bikin ne ev e. Divê em munaqêşe bikin ka xusûsiyên îdeolojîk-politîk, rêxistinî yên van partiyên çi bin.

## Stiriyan me

Lawikê Berrivani

## Ma wê hinekê ziman di devê me kin?

Di dawiyê meha Gulanê de du parlamenterên HEP'ê (Partiya Gel a Kedê) yên kevn (Orhan Dogan, Hatîp Dicle) û du berpirsiyarên wê (sekreterê giştî Ahmet Karataş û serokê HEP'a Diyarbekirê Huseyin Turhalli) li Stockholmê bûn. Di ve nabênê de jî radyoya Swêdê, redaksiyona Tirkî, Merhaba bi wan re reportajek kir. Li ser gelşa Kurdî û hin mewziyên din bîr û baweriyên wan pirsîn.

Piştî gelek pîrs û bersîvan mesele hat ser weşanên Kurdî. Kesa pîrs dipirsî fena ku bibêje, berê we digot zimanê me yasax e, lema jî em nikanin weşanên bi Kurdî derxin. Lê nuha ew yasax jî nemaye û waye hûn hûn jî rojnemeyên xwe bi Tirkî derdixin.

Muhatabê pîrsê serokê HEP'a Diyarbekirê, H. Turhalli bû: -Nuha ez dixwazim ji xwe numûnê bidim. Wexta min dest bi mektebê kir ez deh salî bûm. Min gotinek bi Tirkî nizanibû. Lê îro ez nikanim bi Kurdî bipeyivim. Gava rojname tîn ber min, ez digrim rojnemeyên Tirkî dixwînim. Li gel ku eynî tişt di rojnemeyên Kurdî de jî hene ez wan naxwînim.

Divê meriv bibêje her bijî, tu çuqasî tiştêkî baş dikî (!) Li ser ve îzaha Huseyin Turhalli, muxabîrê got:

-Ê qey Özgür Gündem (Rojava Azad. Bi Tirkî derdikeve, rojnameyeke rojane ye) ji ber ve yekê derdikeve?

-Belkî jî ji ber ve yekê ye.

H. Turhalli jî bo ku xwedîya pîrsê jê bawer bike, hin numûne jî dan. Li gor gotinên wî, heger ew rûpeleke rojnameya Kurdî di niv seetê de dixwîne, ya Tirkî de pênc deqîqan de diqêdîne. Û ev yek jî rehetiyekê dide wî.

Muxabîra Merheba carê ba li "serokên" me anîbû. Dixwest yek bi yek bi wan bide gotin ku ne tenê ew bi Kurdî nizanin, her wisa Kurd wek millet jî nikanin bi zimanê xwe bixwînin û rojnemeyên Kurdî bidin jiyandin. Lema jî ji Hatîp Dicle re got, "çima Özgür Gündem bi Tirkî derdikeve?"

H. Dicle jî wek H. Turhalli bersîveke li gor "dilê" muxabîrê da, got nizanîm "me bi Tirkî xwendîye û em bi Tirkî difikirin" û hwd. Bi kurtî, yanî em Kurd nikanin bi zimanê xwe bixwînin Kêfa muxabîrê pîr ji van bersîvan re hat, lema jî pîrsî:

-Yanî tu dibêji Kurdî bi qasî xwendina rojnameyeke rojane nayê zanîn?

H. Dicle ev yek di cî de tesdîq kir û got:

-Belê, ji xwe hedîse ew e.

Li hember bersîveke wiha wek Kurdekî ez li ber xwe ketim. Çimkî daxwaza ya pîrs dikir jî ev bû. Dikane bête gotin ku H. Dicle û H. Turhalli qala rastiyekê dikirin. Rast e ew û gelek Kurdên wek wan bi zimanê xwe nizanin û asîmilê bûne. Lê pîr-kurdiya Kurdan ne di rewşa wan de ne û zimanê xwe jî ji bîr nekirine û dikanin rojnameyeke Kurdî bixwînin.

Ya din ger em îddîa wan qebûl bikin jî, derxistina rojnameyeke bi Tirkî ne çare û riya xelasbûna ji asîmilasyonê ye. Ji bo ku em kanibin rê li ber asîmilasyonê bigrin û nehêlin bi hezaran kesên din jî têkevin rewşa Turhalli û Dicle, ma ne divê em zorê bidin weşanên bi Kurdî; di nav xwe de bi Kurdî bipeyivin, rojname, kovar û kitêbên xwe bi Kurdî derxin. Çimkî panzehîra asîmilasyonê pêşdebirin û belavkirina xwendin û nivîsandina Kurdî ye. Ne ku em him bibejin em bi Kurdî nizanin û him jî ji berêvkê ve rojname û kovarên xwe bi Tirkî derxin. Di vî warî de divê em xwedî prensîb û siyaseteke zelal bin. Divê em li mala xwe bi Kurdî bi axifin, xwendin û nivîsandina xwe bi Kurdî bikin. Gava wiha nebe, ma wê hinekê ziman tîxin devê me?

Ji xwe berê têra xwe weşanên bi Tirkî hene, îcar wexta hêzên Kurd jî rabin, bi çi nêtê dibe bila bibe pêşengiyê bidin weşanên bi Tirkî wê gavê ew jî bergehê li asîmilasyonê firehtir dikin.

Heta îro me demexistina weşanên bi Kurdî bi yasaxa dewletê ve girê dida. Lê nuha bi şiklekî bi sînor be jî ew yasax nema ye, baş xerab em dikanin weşanên bi Kurdî derxin. Îcar gava di demek wiha îstîsnaî de di dêlî ku em giraniyê bidin weşanên bi Kurdî bidin yêza bi Tirkî, wê wextê jî gelek kemalîst û şovenên Tirk sîr û pîvaza di pozê me ve dikin. Mesela wê rojê Emîn Çolaşan di quncikê xwe de wiha henekê xwe bi kesên ku rojnamên Tirkî derdixin, dikir:

-Kesên ji xwe re dibêjin em Kurtçî ne û li dijî dewleta Tirk şer dikin, ji ber çi be jî bi Tirkî dipeyivin. Me, di telewîzyona xwe de li Apo temaşa kir. Tirkîya wî ji ya me baştir bû.

Ma bes ev? Rojname û kovaran derdixin, giş bi Tirkî ne!.. Çimkî yên bi Kurdî tîn weşandin nayên firotin. Ji bo çi rojnemeyên xwe bi Tirkî derdixin? Ma ne divê ew bi Kurdî bin?

Gava yên ku xwe serokê Kurdan dibînin, piştî hewqas teqereq, hewqas şehîd û xwîn hîn jî giraniyê bidin weşanên bi Tirkî û bibêjin, *Tirkî ji me re rehetiyekê tîne*, bi ya min, Emîn Çolaşan çuqas sîr û pîvaz di pozê me ve ke jî hindik e...

*Gerrek dîrokî li nav arşîvan*

*Celîl Celîl*



# Nama serokên şoreşa Kurdên Iraqê ji Stalin re



Sala 1964'an Kurdnasê Sovyetî yê xuya Oleg Lyûdvîgovîç Vilçevskî wefat kir. Bi biryara serokatiya Enstîtuya Etnografya Akademiya Zanyariyê ya Sovyetê ya beşê Lenîngradê, ku O. Vilçevskî salên dawiyê karê zanyariyê lê dikir, arşîva wî, dewletê kire milkê xwe, ji malê bir, ku li enstîtuyê biparêze. Pirtûkxana wî ya enstîtuya Rohilataniyê ya beşê Lenîngradê ji keça wî kirî.

Salêk di ser mirina O. Vilçevskî re derbas bûbû. Bi salix-sulixan, telefona keça wî min ji nasan girt û ez pê ra peyivim. Me li hev kir ku ez herim mala wan û eger pirtûk, yan tiştên mayîn ên hêja li ser Kurdnasiyê hebin, bikirim.

Li gorî lihevkerîna wê êvarê ez çûm mala keça O. Vilçevskî. Li malê bi rastî tiştên girîng nehiştibûn, hemû destnivîs û pirtûkên wî dewletê biribûn. Hin gotarên ji kovaran yên li ser Kurdan û nameyên bêqîmet mabûn.

Sê rûpelên rengavîti bala min kişandin ser xwe. Li ser wan belgan bi qelama reş tişt hatibûn nivîsin, xuya bû ku nivîsar hahanga kiribûn. Ew, reşê wergera nemeyekê bûn. Gava min xwend, buhayê nivîsarê ji min ra xuya bû û ew belge min ji xudanmalê hîvî kir ku ez wan bi xwe re hildim. Keça O. Vilçevskî negot na.

Ew li ser rewşa wergera nama serokê partiya Kurdan ya

Demokratên Iraqê bû, yên piştî şikestina şoreşa Barzaniyan li salên piştî Şerê Cihanê yê Dudan ji mecbûrî çûbûne Îranê û ji wir jî li ser doza Kurdên Iraqê ji serokê dewleta Sovyetê Stalin re rêkiribûn.

Helbet, orijînalê vê namê îro ne li Kurdistanê, ne jî li Sovyetê nayê peyda kirin. Bêguman buhayê vê namê ji bo dîroka gelê Kurd heye û hêja ye ku ew neyê wundakirinê.

Orijînalê namê bi du zimanan hatibû nivîsandin; bi Kurdî û bi Erebi. Ya di destê min da reşa wergera wê namê ye ku bi zimanê Rûsî ye. Wergera vê namê min ji zimanê Rûsî cardin wergerandê ser zimanê Kurdî û em, wergera wergerê raberî xwendevanên "Armançê" dîkin.

Gava eslê vê namê bê dîtin, emê bibînin, ku zimanê wergera wergerê ji eslê xwe dûr e.. Şik tê tune, ku niyet û navero-ka herduyan wê gelekî nêzikî hev bin.

Wergera namê ya zimanê Rûsî ku gihîştîye destê Stalin, ew bi xwe dökument e, nixê wê heye. Ev yek wekî O. Vilçevskî bi xwe reşa vê namê neavêtiye û bi salan di arşîva xwe de parastîye, diyarkirina wê yekê ye, ku wî jî nixê vê nivîsarê baş zanibûye û ji bona dîrokê hiştiye.

Îcar em bêne ser wê pirsê, çima reşwergera vê namê li cem O. Vilçevskî peyda bûye?

Di Şerê Cihanê yê Dudyayan de eskerê Sovyetê tevî eskerê dewletên Roava ket nav erdê Îranê: Sovyet ji bakur, dewletên Rojava ji başûr. Di dawiya şer de li ser axa Azerbeycana Îranê, Komara Azerbeycanê ya Demokratîk hate avakirinê, lê li ser axa Kurdistanê ya Demokratîk bi paytexta Mehabadê (Sawicbulax) hate avakirinê. Di nava kesên ku tevî eskerê Sovyetê pevgerîdana Sovyetê û Kurdên Îranê dimeşand, yek bi xwe O. Vilçevskî bû, Kurdan û Îranzanekî jêhatî bû.

Hê di salên sîhî de O. Vilçevskî çend gotarên hêja li ser dîrok, aborî û çanda Kurdan di kovarên zanyarî yên Sovyetî de bi zimanê Rûsî çap kiribûn. Di salên şer da ew, wek em dibînin, bi karê praktîk di meydana polîtîka Sovyetê de li Rojhilata Nêzik û Navîn girêdayî bû.

Piştî ku rabûna Barzaniyan li Kurdistanê Iraqê şikest û serokên Kurdan derbasî sînorê Îranê bûn, wan li Komara Kurdan ya Demokratîk xizmeta xwe ya welatperweriyê dom kirin û pê ra jî gumana xwe ji armanca azadiya Kurdên Iraqê nebîrin. Daxwaza wan ew bû ku bi piştevaniya Sovyetê Kurdistanê Iraqê serbest bikin. Wan li ser navê Kurdên Iraqê yên şoreşgêr nameke taybetî ji

**Nama serokên şoreşa Kurdên Iraqê ji Stalin re**

*Ji gênêralîsîmûs heval Stalinê qedirzan re;*  
 Em serokê tevgera şoreşgêr ya parçê gelê Kurde Iraqê ne. Em mihacir bûne û ji mecbûrî me barkirîye, em hatine Azerbeycana Îranê ji bo Eskerê Sor me biparêze. Em zabit, karkerên siyasî û rewşenbîrên Kurdên Iraqê, me Partiya Kurdan ya Demokratîk damezirandîye ji bo şerkariya li hemberî faşîzmê, paşverûtiyê û emperyalîzmê. Li ser vê bi pey me ketine û ji dûr va biryara kuştina me derxistine.

*Gelê Kurd, hewara xwe ji te, birayê mezin re daxistîye, bi wê hêviyê, ku tu alîkariya me bikî ji bo serxwebûna me, ji bo nanê rojane ji bo bicîhanîna mafê me yê demokratîk.*


*Rast e gelê me biçûk e û axa welatê me ne mezin e, lê em gelek çerçirine û me li ser riya xebata siyasî û şoreşgeriyê gelek şehîd dane. Şehîdê vê yekê, ew rabûna eşîrên Kurdên Barzanî ya dawî ye.*

*Bi rastî, tu hevrêyê gelên biçûk û bindestî, ji bo wê jî hêviya gelê Kurd ji te heye, ku tu li ser riya şerkariya me ya azadiyê ya xelasbûnê ji bin nîrê emperyalîzmê, li ser riya şerkariya me ji bo rizgarkirina welatê xwe, wekî em bigîjin armanca xwe; piştî me bigrî rejîma demokratîk bê damezirandinê û em dewleta milî ava bikin.*

*Hevalê Stalin, gumana me ya mezin li ser wê heye, ku di vê de wa jûyîn mirinê de ji bo azadiya gelê me tu yê alîkarê me bî.*

Ûşnû, 25. 01.1946 (Kanûnî Evvel 1365)

**Mustefa Xoşnav** (Kapitanê eskerê Iraqê yê berê)  
**Mîr Hac Ahmed** (Kapitanê artîleriya eskerê Iraqê yê berê)  
**Hemze Ebdulle** (Avukat)  
 Nûnerên Partiya Kurdên Iraqê ya Demokratîk û tevgera rabûna Barzaniya



Nimûna rûpelê pêşîn ê destnivîsa wergera nama Kurdên Iraqê ji Stalin re serokê dewleta Sovyetê Stalin ra nivîsî û dane nûnerên Sovyetê yên ku li Îranê bûn.

Wek tê zanîn O. L. Vilçevskî wan salan li Îranê bû û ew name gihîştîye destê wî û bi wergerandina wî nivîsara namê gihîştîye destê serokê dewleta Sovyetê, destê Stalin. Kopyeke wê wergerê, wergêr li cem xwe hiştiye.

Ev name çîrûsêke biçûk e, ku rûpeleke dîroka şerkariya gelê Kurd ronahî dike. Em ji vê

namê cardin dibînin ku bawerîya gelê me li hemberî dewletên mezin, ku bi piştevaniya wan bigihîjin armanca xwe, çiqasî mezin bûye.

Ew guman me hîn nebiriye. Û her car em dibînin, ku bi wê em tene xapandinê. Ya rast ew e, ku em gumana xwe bi giranî deynin ser xwe, em bi destê xwe gere birîna xwe derman bikin, piştevan wê xwe bi xwe peyda bibin.

Li ser pirs û pirsgirêkên Kurdistana azad reportajek li gel Samî Abdurrehman, Noşîrvan û Felekeddîn Kakeyî

# Tu millet nikare bi xêratan bijî

## Mîrza Bextiyar

Piştî hewqas kuştin, koç, xopanî û amargoyê jî di demek kin de Kurda li deverên azadkirî kontrolê pesindar tesîs kirine. Ji şêşê pênc başên Kurdistana Iraqê rizgar kiriye û îdare bi temamî di destê Cephaya Kurdistana de ye. Piştî hilbijartinên 17'ê Gulana 1992'an parlamentoya ku wê bê danîn wê wezîfê bigre ser xwe. Tevî wê tabloya rûgeş jî mij û xumama li ser bersîvên hin pirsan bi temamî ranebûye; pirsên ku mirov kûr difikirin: "Di têkoşîna gelê Kurd de wê rola parlamentoyê çî be?", "Partiyên siyasî wê tehemula netîceyên hilbijartinan bikin?", "Dewletên hevpeyman heta kîngê wê piştigiriya rewşa îroyîn bikin?", "Guftûgoyên otonomiyê yê rawestiyayî, wê carek din dest pê bike?", "Tirkiye, Îran, Sûriye wê heta kîja kertê wê tehamula Kurdistana azad bikin?", "Ev rewşa ne diyar dirêj bajo, gelo Kurd wê bikaribin di hêla aborî de xwe bi xwe îdare bike?"

Me ev pirsên ku di serê gelek Kurdî de ne, ji Serokê Partiya Demokratîk a Gelê Kurdistan, Samî Abdurrehman, Cîgirê Serokê Yekîtî Nîştîmanî Kurdistan, Noşîrvan Mustafa û Endamê Komîta Merkezî ya Partî Demokratî Kurdistan, nivîskar Felekeddîn Kakeyî pirsî.

Roja 10'ê Nisana 1992'an em li Hewlêrê meqerê Partiya Demokratîk a Gelê Kurdistan rûniştûn, li gel Samî Abdurrehman. Ew ji ziyareta Îranê hîn nuh vegeyabû. Ne wek carên ku min berê ew dibû rûbiken bû, bê kêf xwiya bû. Dema bersîvên pirsan dida, pîr hêdî bi diqateke mezin diaxiffî. Li gor pirsîkirina pirsan, fikrê me texmîn dikir û heger bersîvên wî û fikrên me yê wî texmîn dikir, ne wek hevûna, dixwest me îkna bike.

## Em nuha hewcedarê merkezeke siyasî ne

Me pirs xwe ya yekem li ser qanûna hilbijartinê kir. Bereya Kurdistana qanûna hilbijartinê qebûl kiribû, lê wek partî gelo bi ailê wan bû. Di derheq %7 barajê de çî difikirî, bi wan feyde û zerrara wê çibû. Bersîva S. Abdurrehman ev bû "Qanûn li ser esasê nispi hatiye danîn. Me jî ev dixwest. Lê bi qeneeta me benda (baraja) %7 zêde ye. Heger qet bend tunebûna, wê îmkana hebûya ku kesên serbixwe jî bîn hilbijartin. Lê qerar %7 derket. Em çiqas ne pê ra bin jî, îhtîrîma qerarê digrin".

Me ev pirs 15 roj şûnde li Sulêmaniyê ji Cîgirê Serokê Yekîtî Nîştîmanî Kurdistan Noşîrvan Mustafa kir. Noşîrvan berî ku

dîtina xwe di derheq wê pirsê de bide, li ser amadekirina qanûna hilbijartinê û li ser şêkil û uslûbên sereke ku li dinyayê çê dibin kir û got: "Bi me xweş bû ku di wê hilbijartinê de kesên serbixwe jî karibin namzetîya xwe deynin, ev jî bi şêkilê hilbijartinê daîre dibû. Wê baştir bûna jî. Lê partiyên piçûk dawa seklê nisbî kirin, me jî wek wan kir". Noşîrvan, di melsela %7 da, berevajî S. Abdurrehman difikire: "Bi a min feyda %7 heye. Çûnkî Kurdistana hewcedarê îstîkrarê ye. Nuha di serkirdayetiya Bereyî Kurdistan de 8 partî hene. Her partî xwedî rayekê ye, mafê her partiyê yê vetoyê heye. Ji ber wê yekê ne mumkun e ku Bereyî Kurdistan bi hêsani biryaran bigre. Heger parlamento jî ji partiyên piçûk-piçûk pêk bîn, ne mumkun e ku ev partî zû bi zû koalîsyonan çêkin, hukûmetê pêk bînin û bi rê va bibin".

Li ser wê bersîva wî, min ev pirs jê kir "%7 ma ne zêde ye? Dibe ku du partî bi tenê bikevin parlamentoyê. Gelek partî tevî hilbijêrên xwe li derveyê parlamentoyê bimînin, ma ev jî nikare hîn xeteriya bi xwe re bîne?" Bersîva wî: "Em nuha hewcedarê merkezeke biryarên siyasî ne. Partiyek an jî du partî dikarin ve bikin. Tecrûbên me dan nîşandan ku 8 partî nikarin vêya bikin.... Bila partiyên ku nikarin sedî 7 derxin, muxalefeta xwe li derveyê parlamentoyê bikin, bila biryarên siyasî li nav parlamentoyê rastî vetoya nebin".

Ev cara yekem bû ku min Noşîrvan didît. Şevkê em bûn mêvanê wî. Li Kurdistana Iraqê Noşîrvan yek ji wan kesan bû ku tesîr li ser min hişt. Jiyaneka wî ya basît hebû û gelek mûtevezî bû. Noşîrvan jî hemû hêlên xwe bêtir bi hêla xwe ya eskerî di nav me Kurda de tê nasîn. Bi naskirina wî, bi sohbeta çend seetan ez bûm şahidê ronakbîriya wî ya kûr û fireh. Bi fakt, bi tarîx, kin lê bi naverok dipeyivî. Pirsên ku herî nedixwest raste rast bersîvê bide jî, bi bersîvên wî mirov têr dibû. Bê westan, bêyî ku kesî li derveyê daîra xwe bide sekinandin, qefle bi qefle wêfd (heyet) qebûl dikir. Me li meqerê wî Şêrko Bêkes û Mula-zim Omer jî dît. Wusa xwiya bû ku her du jî hevalên wî yê nêzik yê xebatê bûn.

Piştî du-sê rojan li Selaheddîn li Polît Buroya PDK-I, em rastî Felekeddîn Kakeyî bûn. Felekeddîn hevaltiya wî bi hevalê bi min re hebû. Çawa wî ew dît, ew himbêz kir, bi awayekî serî, hal û xatirê wî pirsî. Tempoya xebata wî ji min re wek di hin filmên Amerîkî de wek rola komîser an rojnamevanên ku bi stres di eynî wextê de çend kar dikir hat. Wusa xwanê dikir kar û barên wî gelek bûn, wek însan jî însanekî nerm ku dixwest dilê her kesî xweş bike,

kesî nexeyidîne, bi her kesî re alaqa dibû. Felekeddîn Kakeyî berpirsyarê enformasyonê yê PDK-I ye, di nav vî karî de berpirsyariya televizyonê, radyoyê, rojnama merkezî ya partiyê Xebat jî heye. Li gel endambûna Komîta Merkezî, herwisa berpirsyarê partiyê yê siyaseta Erebi ye. Yê jî me ve xuya bû, bêyî me karê muxabîrekî Amerîkî ji şirketeka televizyonê, berpirsyarê xwendevanên bajarê Hewlêr, nivîskarekî tiyatroyê û hinekên din ku me nizanibûn kî ne, pê ra hebû. Ji



**Samî Abdurrehman: Welat cînarên xwe bi destê xwe tayîn nakin. Tarîx û coxrafya cînarên mirov tayîn dikin. Watîniya Bereyî Kurdistan e ku şertên jiyanê û pêşkevîtiyê jî bo vî miletî temîn bike. Tu mecbûrî ku hevkarîyê bi Îranê re jî, Tirkiyê re jî, Sûriyê re jî bikî. Ji bo meslehetê gelê xwe divê tu bi Amerîka re jî, bi Ewropayê re jî û bi Mîsrê re jî hevkarîyê bikî.**

ber tijebûna programa me ya her-du alîyan li ser se'eta hevpeyivîne me li hev nekir loma jî me xwest bersîvên pirsan bi nivîskî bide. Felekeddîn Kakeyî, qanûna hilbijartinê parast û di derheq %7 de jî got ku him başî û him jî nebaşîya wê hene: "Nebaşîya wê, jî sedî 7 rîya parlamentoyê li partî û komikên biçûk digre. Ev jî bi taybetî di wê paradoksa Kurdistana de xizmeta yekîtîyê nake. Baştir bû ku formulek bihata dîtîn û pîraniya partî û rêxistinên, heta serbixwe jî karibûna xwe bigihandina parlamentoyê. Başîya jî sedî 7 jî ew e ku wê îxtarekê bide kesên ku partî û rêxistinên dadimezrînin. Divê kesên wiha hîn bêtir şiyar bin da ku xebata siyasî li ser esasê îlmî û şeweyeke objektîf û rêk û pêk bi rê ve bibin ku bikaribin ciyê xwe li dem û dezgeyên meşrû de bigrin. Çûnkî di van 10-15 salên dawî de gelek

partî û rêxistinên biçûk yê siyasî pêk hatin ku hiç esasekî objektîf yê wan tunebûn. Dijmin jî êdî wek nuha wê nikaribin ji bo belavkirina rêza gelê Kurd grûbên biçûk çêbikin".

Partiyên siyasî çî rolê didin parlamentoyê, çî ji parlamentoyê hêvî dikin? Dema F. Kakeyî bersîva wê pirsê da, ji bo çêkirina hilbijartinê PDK-I çawa rol listiye, çawa Mesûd Barzanî jî bo wê yekê xebitiye, kir: "Em wek partî jî serî de alîgirên hilbijartinan

vin; wek domkirina guftûgoyan, yan îtîfaqkirin bi hukûmeta Iraqê re, têkiliyên derveyê Kurdistan û her wekî din". Li ser pirsê min a "piştî çêbûna parlamentoyê wê rewşa çekdaran çawa bibe? Dîsa her partî wê ordiyek xwe hebe?", bersîva wî: "Heger wek xwe bimîne xerab e. Em hêvîdar in hemû bibin yek leşker. Partiya Gel sedî sed li gel wê yekê ye".

Rola Noşîrvan dida parlamentoyê ne cûda bû: "Desthilatên parlamentoya me gelek in. Parlamentoya me dikare biryara siyasî ya çarenûsa gelê Kurd bide. Hemû peyman û rêkewtinek di navbera gelê Kurd û hukûmeta Iraqê yan jî dewletek dîtir yê dunyayê de, divê muwafeqeta parlamentoyê hebe. Parlamentoya me wê hukûmeta dahatî ya Kurdistana hilbijêre. Parlamentoya me wê butça Kurdistana deyne. Lê çî heft li kêleka parlamentoyê wê lîderê bê hilbijartin ku desthilatên wî jî gelek in". Li ser pirsê me ya, hêzên Kurd yê siyasî wê tehemula netîceyên hilbijartinê bikin, Noşîrvan got: "Ez kefaleta tu partiyê nakim. Lê emê wek Yekîtî Nîştîmanî Kurdistan tehamulê netîceyê hilbijartinê bikin. Netîce çî dibin, bila bibin, emê îhtîramê nîşan bidin.

## Ji bo parastina yekbûyîna gel û tevgera wê koalîsyon pêwîst e

Me dîsa ji Noşîrvan pirsî: "Em bibêjin di hilbijartinan de partiyekê pîraniya kursiyên girt. Di wê rewşa taybetî de ji bo temsîlek hîn firehtir pêk bê, ma koalîsyonek ne pêwîst e?" Ew bişîrî û got: "Me û partiyê (PDK-I) nuha ve li ser gavên dawîya hilbijartinê lihevkerîye. Li gor netîcên hilbijartinê ew partiyên ku di parlamentoyê de wê temsîl bibin, hukûmetê koalîsyonî çêbikin ku li Kurdistana îstîqrarek durust bibe. Ne ku hin partî li parlamentoyê di muxalefetê de bimînin, jî bo ku hukûmeta li ser kar, bixînin, bixebitin û ji nuh ve hukûmetê din ava bikin û ev her weha dom bike".

Bersîva F. Kakeyî nêzî nêrîna Noşîrvan bû: "Wusa diyar e wê koalîsyon durust bibe. Partî ji nuha ve hewil dide ku li nav parlamento û ji bo organa rêvebirinê koalîsyon durust bibe. Ev jî bo parastina yekbûyîna gel û tevgera wî pêwîst e. Bivê nevwê wê rola encama hilbijartinê di tayinkirina şêkilê koalîsyonê de hebe".

Gelo dewletên Ewropî û yê cînar bi çî çavî li hilbijartinan dinêrin û şêla wan li hember parlamentoya Kurd wê çî be? Li gor Noşîrvan dewletên Ewropî xweş li wê meselê dinêrin; "Qandî ku em dizanin bi hemû dewletên Ewropî xweş e ku em hilbijartinan

çêdikin. Parlamentoyên Britanya, Fransa, Almanya soz dane ku di dema hilbijartinan de nûnerên xwe wek çavdêr bişînin Kurdistana. Parlamentoya Ewropa jî soz daye ku nûnerên xwe bişînin. Me parlamentoyên dewletên cînar (Tirkiye, Sûriye û Iraq) dawet kir ku ew jî nûnerên xwe wek çavdêr bişînin. Lê heta nuha me tu xeberek ji wan negirtiye".

### Parlamentoya Kurd wê biryara domkirin yan qutkirina guftûgoyan bide

Guftûgoyên bi hukûmeta Iraqê re dibûn, bi bêbiryar, bê encam, bi bêdengî, rawestiyar. Lê qut jî nebûne; wê piştî hilbijartinan çî bibe, amade ne ku piştî hilbijartinan careke din bi hukûmeta Iraqê re rûnin. Me di derheqa guftûgoyan û dahatûya wan de ji wan pirsî.

Samî Abdurrehman pêşî bi

anîn. Bes bê nivîsandin bi nav ku wê dûv re wê li ser vê meselê bê rawestandî. Ew di vê meselê de nehatin pêş. Bi raya min xeletiyek mezin kirin ku nehatin pêş".

Piştî van gotinan, S. Abdurrehman sekîni, li ser pirsê min a "baweriya we heye ku bi Seddam re careke din ji bo otonomiyê rûnin? Hêvî heye ku mesela otonomiyê pê re hal bikin" domand; "Zeman zemanê guftûgo û li hev kirinê ye. Li seranserê dinê, dema tefendina şeran e. Xelk dawa heqê xwe bi riya guftûgoyan dike. Em di wê baweriyê de ne ku kîngê mecal hebe ji bo huqûqê Kurdan guftûgo, diyalog bê kirin, divê em rûnin. Tu rûnî tiştê e, îtîfaq bikî tiştê e. Tu wê demê îtîfaq dikî ku îtîfaq bi dilê te be, bi raya te be, li gor huqûqê miletê te be. Me çar mehan guftûgo kir, em negihîştin îtîfaqê. Wê demê şertên me cûda bûn. Em wê demê li Rewanduzê, li Korê bûn, li

Noşîrvan jî pirsî ku tu hêviyên wî hene ku otonomiyê pêbawer bi rejîma Seddam re çêbibe. Bersîva wî ev bû: "Ez bawer im yek ji riyên siyasî, dîplomasi, guftûgo ne. Heqê miletê Kurd jî heye riya guftûgoyan bigre. Ev ne mesela baweriya me bi hukûmeta Iraqê heye an tune. Tabîî ye ku baweriya me bi hukûmeta Iraqê nayê. Baweriya hukûmeta Iraqê jî bi me nayê. Lê mesela lihev kirinê di navbera du aliyan de, teraziya quwetê qerar dide. Ne ew e ku baweriya wan bi me heye an ya me bi wan heye. Carna mumkun e ku du komên ku baweriya wan bi hev tune, lê menfeeta wan di yek tiştî de heye, îtîfaq bikin. Kurd, piştî hilbijartinê bikaribin rewşa xwe baştir bikin, dikarin lihevhatinek gelek baş li ser hukûmeta Iraqê ferz bikin".

Di vê pirsê de F. Kakeyî jî weha got: "Wê çarenûsa guftûgoyan, Encûmenî Nîştîmanî Kurdistan (parlamento an jî Meclîsa Kurd) diyar bike. Sedemê rawestandîna guftûgoyan helwesta rejîma Iraqê bû. Heta nuha kêmtirîn radeya daxwazên Kurd qebûl nekiriye. Li ser çend navçeyên girîng yê Kurdistanê, wek Kerkûk û ciyên din negihîştine tu encamî". Piştî van gotinan F. Kakeyî raste rast nabêje ku hêviya lihev kirinê bi hukûmeta Iraqê re nemaye, lê bi gotinên xwe dijiwariya wê dide diyarkirin: "Hukûmetê ablûqa aborî û îdarî xiste ser Kurdistanê. Bi vê biryara xwe jî rewş hîn aloztir kir. Divê ji bîra me neçe ku hukûmeta Iraqê nikare tehamula azadiya siyasî û serbestiyê bike, wek a ku îro li Kurdistanê heye. Her wisa li dijî hilbijartinê jî rawestiya".

Guftûgo tam qut nebûn jî ji bo roja îro hêvî tune ku bigîje encamê. Nuha tu îşaret tune ku li Iraqê rejîma Seddam jî hilweşe, rewşeke nuh peyda bibe. Di vê rewşê de dewletên hevpeyman wê heta kîngê sitariyê li Kurdistanê bikin. Wek tê zanîn wextê dewletên hevpeyman di nivê heyva Hezîranê de diqede. Gelo wê dirêj bikin? Helwesta Tirkiye wê çî be?

F. Kakeyî, S. Abdurrehman û Noşîrvan, her siyan jî gotin ku dewletên hevpeyman wê li herêmê bîminin û bi hêvî bûn ku Tirkiye jî wê vê yekê qebûl bike. Samî Abdurrehman: "Dewletên hevpeyman li herêmê mayîna xwe wê dirêj bikin. Lê divê qebûlkirina Tirkiye jî li ser vê meselê hebe. Hukûmeta Tirkiye jî dibêje emê bibin parlamentoyê. Heger bibin parlamentoyê piranî di destê hukûmetê de ye. Ez di derheq vê meselê de optimîst im. Lê dîsa her 6 heyva carekê dirêj kirin, haletê bi îstiqrar durust nake".

Noşîrvan: "Wek me bihîstiyê wê dirêj bikin. Heger Tirkiye qebûl bike...". F. Kakeyî jî: "Bi baweriya min wê heta radeyekê dom bike. Heta rewş weha be, hêzên Netewên Yekbûyî wê li Kurdistanê bîminin".

Lê heger em bibêjin di rewşa îro de dewletên hevpeyman paş vekişin, wê rewşa Kurdistanê çawa be? Li gor Noşîrvan, "Diyar e. Iraq wê hucûm bike, wê şer di navbera Kurdan û hukûmeta Iraqê de derve". S. Abdurrehman nexwest raya xwe raste rast bi-

bêje, lê daxwazên dilê xwe got: "Heger îro şer li Kurdistanê tune, sedema sereke dewletên hevpeyman in ku li herêmê ne. Çi heyf aştiyek pêbawer li Kurdistanê nehatiye bicîhkirin. Ji ber vê hindê miletê me bêhuzûr e ku wê dahatûya wan çî be. Ji bo vê yekê em dixwazin piştigiriya navnetewî, bi şeklekî vekirî û ji bo mudetek dirêj bê dayîn ku heta rewşek ewlehî ji bo Kurda çêdibe û Kurd heqê xwe werbigrin".

### Welat cînarên xwe bi destê xwe tayîn nake


Me ji Samî Abdurrehman pirs kir, "Nuha tîkiliyên we bi dewletên cînar re çawa ne?"

-Welat cînarên xwe bi destê xwe tayîn nakin. Tarîx û coğrafya cînarên mirov tayîn dikin. Watinîya Bereyî Kurdistan e ku şertên jiyanê û pêşkevîtiyê ji bo vî miletî temîn bike. Tu mecbûrî hevkarîyê bi Îranê re jî, Tirkiyê re jî,

ên her du partiyên hene. Tîkiliyên me bi dewletên cînarên re baş in.

Me ji F. Kakeyî û Noşîrvan pirsî, li Tirkiyê hin rojname, hêz û kes dibêjin an şik dikin ku Bereyî Kurdistan bi taybetî jî Yekîtiyê û PDK-I li ser hesabê Kurdistana Bakur (Tirkiyê) bi Tirkiyê re tîkiliya datînin, rastiya vê yekê çiyê? F. Kakeyî:

-Bi fikra min gelê Kurd yê hêja li Kurdistana Bakur divê netirse ku em li ser hesabê wî pêwendî datînin. Naxêr. Ev pêwendiyên ku di navbera Bere û hukûmeta Tirkiyê de ne, di encamê de wê ji bo berejewendî û qazanca gelê Kurd û Kurdistana Bakur be jî. Noşîrvan jî weha bersîv da: "Ev ne rast e. Em bi Tirkiyê re cînar in. Heger Kurd li Tirkiyê hebin, yan tunebin, Tirkiye bixwaze bi cînarê xwe re tîkiliyê deyne, em hazir in tîkiliyan deynin. Tîkiliyên me yê bi Tirkiyê re ne li ser hesabê Kurdên



**F. Kakeyî: "Tirkiye heta nuha li hember Kurdistana Iraqê wek temaşevan nemaye. Heta nuha piştevaniya me nekiriye û ji rewşa Kurdistana Iraqê ditirse. Tirkiye dixwaze em hiç mafekî wernegirin, yan jî kêmtirîn mafê me hebe. Herwiha Tirkiye zêdetir bi çavê emniya xwe temaşa rewşa me dike. Ditirsîn ku rewşa me ji bo wan gelşan peyda bike û bibe starek ji bo mesela Kurd li Kurdistana Tirkiyê."**

kurtî qala pêvajoka guftûgoyan kir:

-Guftûgoyên bi hukûmeta Iraqê re 4 mehan ajot. Em gelek caran bi wan re rûniştin. Li ser gelek maddeyan em li hev hatin jî. Munaqesên me li ser otonomî û demokrasiyê bûn. Di rûniştandina dawî ku me di heyva, Tebaxê de kir, li ser pirsê herêmên Kurdistana. Kuder Kurdistan e, kuder ne Kurdistan e, kuder wê bikeve nav hudûdê otonomiyê, kuder wê nekeve, bû astengê mezin di navbera me de.

Li ser vê yekê me 3 şert pêşniyar kir. Ev herêmên ku naxwazin tîxin nav otonomiyê (Xanîqin, Şengal, Kerkûk û hwd.) şertên wan tabîî bê hiştin. Xelk vegere ciyê xwe, mal û halên wan bidin wan, xelk karibe erd bikire, xanî avabike û bifroşe. Îdarekî muştêrek ji Ereb û Kurdan bê pêk

Şeqlawê bûn. 3 milyon Kurd derbeder bûbûn. Lê nuha pêşmerge 40-50 km. li başûrê Hewlêrê ne, li başûrê Dihokê ne, li başûrê Sulêmaniyê ne. Qismekî ji Kerkûkê hatiye rizgarkirin. Wextê firsê hebe ji bo guftûgoyan, em li gel guftûgoyan in. Dimîne li ser çî guftûgo dikin".

Di pirsê dahatûya guftûgoyan de nêrinên Noşîrvan jî ev bûn: "Guftûgo li nav Bereyî Kurdistan rawestiyaye heta ku hilbijartin çêbibe. Parlamentoya Kurdistan wê biryar bide ku guftûgoyên bi hukûmeta Iraqê re qut bibin an bînin domkirin; Li ser otonomiyê bîminin, an jî otonomiyê zêdetir daw bikin; Ew proje û pêşniyarên ku hukûmeta Iraqê bo Bereyî Kurdistan kirine, tînin qebûlkirin an nayên qebûlkirin; Hemû parlamentoya dahatû biryar dide". Her wekî S. Abdurrehman me ji



**Noşîrvan Mustafa: "Ez bawer im ji riyên siyasî yek dîplomasi, guftûgo ne. Heqê miletê Kurd jî heye riya guftûgoyan bigre. Ev ne mesela baweriya me bi hukûmeta Iraqê heye an tune. Tabîî ye ku baweriya me bi hukûmeta Iraqê nayê. Baweriya hukûmeta Iraqê jî bi me nayê. Lê mesela lihev kirina di navbera du aliyan de, mîzîna quwetê qerarê dide"**

Sûriyê re jî bikî. Ji bo mesleheta gelê xwe divê tu bi Amerîka re jî, bi Ewropayê re jî û bi Misrê re jî hevkarîyê bikî.

-Lê dixwazim li vir ser noktekî bisekinim. Ew dewletên ku perçekî Kurdistan tê de ye, cê nabe hiç bi çî şeklî hevkarî bi hukûmeta wî dewletî ser hesabê Kurdên wî welatî bike. Wek nimûne em hevkarîyê bi Îranê re dikin, lê Îran bibêje ev hevkarî divê li ser hesabê Kurdên Îranê be yan jî bibêje divê hun vî karî li dijî Kurdên Îranê bikin, ev nabe. Ev nayê qebûlkirin. Heqîqet jî, tiştê weha heta nuha daxwaz nekirine".

Noşîrvan jî dîtinên nêzî yê S. Abdurrehman diparêze:

-Nuha tîkiliyên Bere jî û yê Yekîtiyê û PDK-I jî li gel Tirkiyê, Îran û Sûriyê hene. Nuha li Îranê, buroyên hemû partiyên hene, li Sûriyê jî heye. Li Tirkiyê buroy-

Tirkiyê ne. Tîkiliyên di navbera me û Tirkiyê de li ser hesabê dijîminatîya Seddam Huseyin in. Li ser hesabê damezirandina nîzamek demokratîk li Iraq e. Dewletên Ewropî jî zorê didin Tirkiyê. Tirkiye alîkariya ku bi me re dike para ku Ewropa wan tevî bazara xwe bike jî heye. Me heta nuha Kurdên Tirkiyê negirtine, nekuştine û ji wan re nebûne asteng".

Diyar e ku Tirkiye ji rewşa îro aciz e, lê Tirkiye heta kîjan radeyî dikare tehemula Kurdistana azad bike? Dema min ev pirsê kir, Noşîrvan bi ken got: "Divê vê pirsê ez ji te bikim". Min jî jê re got em rojnameyan taqîb dikin, ji beyanên wan mesajan derdixin, lê yê we tîkiliyê hene, mesajê wan raste rast digrin. Hûn dikarin bêtir psikolojiya wan fêhm bikin".

## Tu millet nikare bi...

Noşîrvan domand: "Demîrel û Ozal di wê wextê de bi beyanên xwe gotin, heger Iraq êrişê bîne ser Kurdistanê, emê piştigirîya Kurdan bikin. Bi rastî heger Kurdên Tirkîyê erdên me li hember Tirkîyê bi kar neyînin, ne bawer im Tirkîye mudaxeleyî karê me bike. Li Kurdistanê Iraqê, Turkmen hene. Li hember mafên ku em bidin wan, Tirkîye dikare piştigirîya me bike".

F. Kakeyî jî weha bersîv da: "Tirkîye heta nuha li hember Kurdistanê Iraqê wek temaşevan nemaye. Heta nuha piştigirîya me nekiriye û ji rewşa Kurdistanê Iraqê ditirse. Ew dixwazin em hîç mafekî wernegirin, yan jî kêmtirîn mafê me hebe. Herwiha Tirkîye zêdetir bi çavê emnî ya xwe temaşa rewşa me dike. Dîtirsîn ku rewşa me ji bo wan gelşan peyda bike û Kurdistanê Iraqê bibe starker ji bo mesela Kurd li Kurdistanê Tirkîyê. Ji aliyê din Tirkîye bûye terafek di helwesta herêmî û cîhanî de li hember Iraqê û Kurdistanê Iraqê. Yanî Tirkîye nikare derkeve derî siyaseta Amerîka, Ewropa û Netewên Yekbûyî. Her ji bo vê ye Tirkîye neçar e ku tehamulî rewşê bike. Piçek jî bi şeweya kar û xebata me ya Kurdistanê Iraqê ve girêdaye."

Heger em karibin bi hêmîni (sakîni) û rêkûpêk teqdirê durustî li rewşa herêmî û cîhanî bikin, emê bikaribin hukumeta Tirkîyê neçar bikin ku mudetek dirêj tehamulî vê rewşê bike. Bi taybetî divê em hewil bidin ku mudaxeleyî karûbarê navxweyî yê Tirkîyê nekin. Wek ku Mustafa Barzanî yê nemir carekê gotibû, divê em di vê demê û dahatû de dostên xwe zêde bikin, dijminên xwe kêmbikin".

### Tu millet nikare bi xêratan bijî

Me ji Noşîrvan pirsî; ev rewşa nuha ya ne diyar dikare dirêj baje. Xelkê Kurd di warê aborî de wê karibe xwe bide jiyandin? Noşîrvan: "Kurdistanê Iraqê welatekî dewlemend e. Ji welatên derve jî hinek yarmetî bêt!.. Wek nimûne em karibin ji bo her gundekî Kurd hezar dolarî temîn bikin, Kurdistan di hêla jiyandê de wê bi ser xwe da bêt".

Me ji S. Abdurrehman jî pirsî; "Nuha Kurdistan azad e, lê xelk birçî ye, memur maaşê xwe nastînin. Wê ev rewşa heta kîngê dom bike? Çûyina Kek Mesûd bo Ewropa û çûyina te ya Îranê jî bo çareserkirina vê problemê bû gawek?". Wî jî got: "Bi raya me tu millet nikare bi xêratan bijî. Yê bi xêratan dijîn, her tim birçî ne. Nuha projeya avakirina Kurdistanê li pêşîya me ye. Em hewcedarî alikariyê ne, bes ji bo yek carê. Heger gundên hemdemî ava bibin, gundên bi elektrîk û av û bi rê, bi medrese û nexweşxane, xelk wê vegere gundan. Wê demê dewra iktisadî dest pê dike. Bi ya min ev destpêka helê ye. Nexwe

kes bi xêratan bijî. Hinek fabriqe li Kurdistanê hene ku wê dest bi kar bikin. Me soz girtiye ku wan bixin kar. Kurdistan, lê bi taybetî Kurdistanê Iraqê yek ji welatên dewlemendtirîn yê dunyayê ye; neft, gaz, av, zira'et. Hemû tişt têde heye".

Ambargoya Iraqê ya li ser Kurdistanê bi hemû hişkayî dom dike. Me pirsî gelo tu hêvî an jî rê heye ku ev ambargoya aborî li ser Kurdistanê rabibe. F. Kakeyî weha bersîv da: "Di van şerta de, naxêr. Bi taybetî jî di vê dema hilbijartinê de. Wê li rewşa piştî hilbijartinê mêze bikin. İhtimal kêmbê ku ambargo bi hêsaniyê rabe. Çûnkî bi mercên siyasî ve girêdayî ye".

Noşîrvan di derheqê vê pirsê de weha got: "Heger Kurdistanê Iraqê rewşa xwe organîze bike, emê bikaribin vê amargoyê bi du-sê rîya ji ser xwe rakin. Yek; hin faktorên bi hêz li hember Iraqê di destê me de hene; du bendavên mezin di destên me de ne; mîntiqên Erebbê jî me digrin; zira'etê bi ava me dikin. Elektrîk jî bendavên me diçin başûr. Xwarinerzaqên ji sînorên Tirkîyê, Sûriyê û Îranê diçin Baxda- de jî erdên me derbas dibin. Di destê me de faktorên bi vî rengî yê girîng hene ku em dikarin hukumeta Iraqê mecbûrî rakirina ambargoyê bikin. Bêyî ku dewletên dinyayê alîkariya me bikin û ambargoya Iraqê ji ser me rakin."

Ji her sê siyasatmedarên Kurd pirsî me ya dawîn ev bû: Piştî hewqas zehmetî û xwînrînê û di vî rewşa ku Kurdistanê Iraqê te de ye, ma otonomî ne kêmbê? Mirov nikare talebeke ji otonomiyê hîn zêdetir bike? Pirsî Noşîrvan kin û hazir bû "Kurdistanê Iraqê îro dikare talebeke hîn zêdetir bike". Me dev jê bernedî pirsî, gelo ew taleb dikare çî be? Wî nexwest bi nav bike, lê hewce dît ku vî îzahê bike; "Parlamentoya dahatû wê biryarê bide. Potansiyela Kurd li Kurdistanê Iraqê, potansiyela aborî, siyasî, eskerî, rewşenbîrî heta çî dereceyî (radeyî) heye. Divê em bersîva wê sibê bidin. Heger sibê em bibêjin konfederalî û potansiyela me têra konfederaliyê neke, em tûştî întixarê dibin. Ev jî bo federalî jî weha ye. Divê parlamentoya dahatû potansiyela Kurd, rewşa dewletên cînar û rewşa dinyayê tespît bike û li gor wê qerar bide".

S. Abdurrehman jî weha bersîva me da: "Şîra Partiya Gel ew e ku mafê çarenûsî li ser esasê nîzamek federalî û demokratî bigrin. Mesela otonomî tu wext di programa Partiya Gel de çî negirtiye. Em ji mêtê ve dizanin kêmbê".

F. Kakeyî nexwest bersîva vî pirsê bide, bes got: "Encûmenî Niştîmanî Kurdistan (meclîs) wê bi navê gelê me vî biryarê bide".

### Lêborîn

Di hejmara berê (127) de sernivîsa nivîsa Vildan Tanrîkulu û Mahmûd Kîper bi çewtî şûna ku "Giyayê hewşê tal e", "Giyayê hewşê malê" hatiye nivîsandin. Ji ber vî çewtîyê em lêborînê jî xwediyên nivîsê û xwendevanên xwe dikin.


## Bersîva Kalê Îndîan

Christofer Columbo 500 sal berê pê li axa ÇermSORAN kiribû. Îsal, di sala 1992 an de li gelek welatên Ewropayê ev keşfa Columbo bi gelek rengî tê pîrozkirin û bibîranin. Bi munasebete biranîneke wiha, min li vî nameya jêrin a giranbûha ya Kalê Îndîan guhdarî kir. Bi yek derbê re min jî nameya Kalo hez kir. Dîlê min lê keliya û loma jî min ew jî Swêdî wergerand Kurdî.

Di wergerandinê de ez li ser du tekstan

xebitîm. Yek, wergera GÖRAN SALNÂS e û ya din jî ya MATS LILJEFORS e. Wergera GÖRAN SALNÂS, wergerê sexsî ye. Li derekê çapnebûye, bes di wê biranînê de hate xwendin. GÖRAN SALNÂS jî İspanyolî wergerandî ye. Di wergera MATS LILJEFORS de (ur Friluftsliv-İvsttil 3/78) navê nameyê "SUQUAMİHÖVDINGEN SEA THE: S budskap 1854" e.

Zinarê Xamo



İşxala Amerîka. Hejmara ehelê çî %90-95 kêmbû.

Teckning: Björn Berg

### WALIYÊ ÎNDÎAN Ê KAL... BERSÎVA HUKÛMETA WAŞÎNGTONÊ WIHA DA:

Waliyê mezin li Waşingtonê gotiye ku ew dixwaze welatê me bikire...

Mirov çawa dikare asîmanan ji germiyana erdê bikire û bifiroşe? Heger mirov ne xwediyê honikariya hewayê, yan jî birqokiya avê be, mirov çawa dikare wan bikire?

Her perçekî vî erdî muqedes e ji bo gelê min. Her tûmekî muheşem (mata de pîno), li peravên me her dilopek şebnem, pîroz in ji bo hafîze û serpêhatiyên gelê min.

Ava ku di tamarên daran de dewr dibe, biranînên ÇermSORAN bi xwe re digerîne.

Miriyên me tu carî vî erdê delal ji bir nakin, ji ber ku ew, diya mirovê ÇermSORAN e.

ÇermSORAN perçekî ji axê ne û ax jî perçekî ji me ye.

Ev kulîlkên ku bîn jê difûrin xwişkên me ne; hesp, şûl, bazê mezin -vîna hemû birayên me ne. Çiyayên qat bi qat, ava mêtgan, germiyana bedena hespê û însan, giş jî yek malbatê ne...

Ev welat jî bo me pîroz e. Ew ava zelal a ku xwe berra ser çerm û cobaran dide ne bes av e, ew xwîna pêşiyên me ye.

Heger em axa xwe bifiroşin we, divê hûn bizanibin ku ew ax axeke pîroz e û her reflekseke es-rarengîz jî ava zelal a çeman, bûyer û biranînên jiyana gelê min tûnin zimên.

Hîme hîma avê dengê bav û kalê min e.

Çem birayên me ne, ew tîna me diçînin.

Çem kelekên me hildigrin û zarokên me tûnin dinê.

Heger em axa xwe bifiroşin we, divê hûn jî bir nekin û fêrî zarokên xwe jî bikin, ku çem birayên me ne; û yê ne ne jî. Divê hûn jî çeman jî wek ku mirov jî birayê xwe hez dike, hez bikin.

Mêrikê ÇermSORAN jî ber êrişên mêrikê sipî tim xwe daye alî, her wisa mijê serê çiyân jî ji ber roja

serê sibê direve. Lê belê ariya pêşiyên me pîroz e...

Em dizanin mêrikê sipî bi urf adetên me nizane. Ew, diya xwe ya axê û birayê xwe yê asîman, wek tiştên ku mirov dikire, talan dike û difroşe; eyne wek pez yan jî wek mirariyên dibîrîn, dibîne.

Ji ber çavnebariyê dixwaze axê gişî daqultîne û li pey xwe bes çolekê bihêle.

Dîtîna bajarên we, çavên mêrikê ÇermSORAN diçîne. Lê dibe ku mêrikê ÇermSORAN hov e, loma jî tiştêkî fahm nake.

Li bajarên mêrikê sipî qet cîyekî tena tune ye. Cîyekî ku mirov karibe bala xwe bidê hela buharan dar çawa dipirçîfin, ya jî meş û mor çawa perikên xwe li hev dixin?

Hemû welwela bajarên we bes heqaretê li guhê mirov dike!

Û qîmeta jiyandê çî dimîne, gava mirov nikaribe li dereke xalî li çirre çirra çûkeke şevê, ya jî bi şev li rex bestekê li munaqesha be-qan guhdarî bike?

Ez mirovekî ÇermSORAN im û tiştêkî fahm nakim.

Em fîskîniya bê ya nerm a ku li rûyê avê dikeve û bîna bê bixwe, ku bi barana nava rojê paqij bûye û bîna esansa dara pelderzî, tercîh dikin.

Hewa jî bo mêrikê ÇermSORAN pîrr bi rûmet e. Ji ber ku her benderuh jî wê feydê dibîne; heywan, dar, însan, hemû vî hewê tenefus dikin.

Welê xuya ye mêrikê sipî hîn baş nizane ku ew kijan hewê tenefus dike. Wek mirovekî li ber mirinê li hember bîna genî bêt his e...

Heger em erdê xwe bifiroşin we, divê hûn baş lê binêrin, wek dereke pîroz bihêlin; wek cîyekî ku mêrikê sipî jî karibe li wir bayê jî kulîlkan jî şîrîntir tam bike.

Li çol û beyaran min bi hezaran laşên bizonên genîbûyî dîtî, ku bi gulleyên mirovê sipî hatibûn kuştin.

Mêrikê sipî divê wek birayê xwe li heywanên vî welatî binêre. Ez mirovekî hov im û tîna-gihîjim hespîka hesinî ya buharê çawa dikare ji bizonan bi qîmettir

be; ku em bes ji bo ku karibin jiyana xwe bidomînin wan dîku-jîn.

Bêyî heywanên kûvî însan çî ye? Heger hemû heywan betta bibûna, ji ber tenhayîya rûhî ya mezin wê însan jî bimira. Ji ber ku tiştê tê serê heywan, wê bêt serê însan jî. Her tişt bi hev ve girêdayî ye.

Tiştê tê serê axê, di eynî wextê de tê serê ewladên wê jî. Heger însan tûyî axê bikin, ew tûyî xwe jî dikin.

Mirovên sipî divê zarokên xwe fêr bikin, ew axa ku ew pê lê dikin ew ne ax e, ew ariya pêşiyên me ye û ew bi xweliya cesedên me bi ber bûye.

Tiştên me fêrî zarokên xwe kirine divê hûn jî fêrî zarokên xwe bikin: Ku ax diya me ye. Her tiştê tê serê axê, wê were serê zarokên wê jî.

Em bi tiştêkî dizanin. Ku ax ne ayidî însan lê ayidî axê ye. Ew hev û du tamam dikin, bi girêdana xwîna malbatî xwe dighînin hev. Însan tevna jiyandê çenekirîye, di vî tevne de ew bes hevda e.

Tiştê em pê dizanin: Xwedayê me yek Xweda ye, ev ax jî ji bo wî gelekî hêja ye.

Ya dawî: Belkî em giş bibin bira; ka em binêrin...

Dibe ku mêrikê sipî jî rojekê pê hay bibe, ku Xwedayê me yek Xweda ye. Ew Xwedayê însan e, hezkirin û sefqeta wî li hember mirovên ÇermSORAN û mirovên sipî bi qasî hev par dibe. Ev ax jî bo wî pîrr giranbûha ye û gava zîrerek bigihîje wê, ew ê jî rûyê xwe jî me biguhere.

Mêrikê sipî wê rojekê qira xwe bîne, belkî jî berî çabîyên din. Ew, çemên xwe jahr dikin, rojek wê bêt, ewê di pîsiyên xwe de bifetisîn.

Heger em welatê xwe bifiroşin we, xatirayên wê yê gava hûn digrin di bîra xwe de bihêlin. Û bi hemû hêzên xwe, bi hemû ruhên xwe, bi hemû dilên xwe wî jî zarokên xwe re veşêrin û jê hêz bikin.




**Hevpeyvînek li ser Kurdên Belûcistanê**

**Li herêmeke Belûcistanê  
30 hezar Kurd**

**Umer Qadir Hesên,** li Belûcistanê Pakistanê li ba-jarê Kwêteyê, li ser Kurdên Belûcistanê hevpeyvînek bi nivîskarê Belûcî yê Kurdnijad **Mîr Ebdulrehman Mîr Hekîmê Kurd** re kir. Ev hevpeyvîn di 19.11. 1990'-de hat kirin û di kovara **Sirwe**; hejmara 67' an de (ku li Kurdistanê Îranê derdîçe) hat weşandin. Em hevpeyvînekê werdigêrin alfabeya Kurdî ya ûpên Latîmî û kurtiya wê ji bo we xwendevanên Armançê çap dikin.

**Armanç**



*Nivîskarê Belûcî yê Kurdnijad Mîr Ebdulrehman Mîr Hekîmê Kurd*

**Pirs:** *Birêz, tika ye xwe bi xwendevanên bide nasîn.*  
**Bersiv:** Navê min Ebdulrehmanê Mîr Hekîmê Kurd e. Ez kurê Mîr Abdulhekîmê Kurd im, temenê min 61 sal e. Ez li gundê Balan hatime dinyayê. Balan 40 km. dûrî Kwêteyê ye. Ew gund ketiye nîveka newalekê ku navê wê Meqamdest e. Ew der cîhê mêtûyî yê Kurda ye. Min li wî gundî dest bi xwendinê kir. Heta 12 saliya xwe, min zimanê Îngilîzî li wê derê xwendiyê. Piştî serxwebûna Pakistanê min 3 salan jî bi zimanê Êrdûyî xwendiyê.

**Pirs:** *Hêja! Ew navçeya ku tu lê hatiyî dinyayê hemû Kurdnişên?*  
**Bersiv:** Erê, nuha jî Kurdnişin e.

**Pirs:** *Nufûsa navçê çiqas e?*  
**Bersiv:** Nêzikî 30 hezar Kurd li wê navçê cîwar in. Dirêjahiya wê 50 km. û pahnayiya wê jî 25 km. ye. 10 km. jî başûrê Kwêteyê dest pê dike. Gişt xelkê wê Kurd in.

**Pirs:** *Ji bil Kurdên navça we nufûsa Kurdên Pakistanê çend nêre?*  
**Bersiv:** Gelek in. Lê ez jimara wan bi sererastî nizanîm.

**Pirs:** *Gelo zimanê Kurdî hin di bîra we Kurdên Pakistan de maye?*  
**Bersiv:** Na... Çimkî ev salan e, ku em ji Kurdistanê dûr ketine. Ji ber wê hindê zimanê Kurdî jî bîra me çûye. Tek û tûk hin peyvên Kurdî di zimanê me de mane. Hêvîdar im, ew jî ji bîra me neçin.

**Pirs:** *Gelo hûn Kurdên Pakistanê niha jî ji layê dewletê ve her bi navê Kurd tenê nasîn?*  
**Bersiv:** Erê, kesên ku Kurd bin û ji bera Kurdan bin, ji alî dewletê ve Kurd tenê nasîn û di pênasên wan de Kurdbûna wan tê nivîsin. A, ev pênasa (huviyet)

min e ku ez bi navê Ebdulrehmanê Kurd hatime nasandin. Di pênasên tevayiya Kurdên Belûcistanê de Kurdbûna wan tê nivîsin.

**Pirs:** *Gelo heta niha bi navê ronakbîrên Kurdan we çî caran Kurdên vir berev kirine û bi navê Kurdan qise bi wan re kiriye, yan na?*  
**Bersiv:** Erê, me gelek caran Kurdên wê derê berev kirine û me gotiye wan ku em Kurd in. Ev e çendik û çend sal in ku em aware bûne. Pêdivê ye em mêtûya xwe bizanin û hevdu nasbikin û alfkariya hevdu bikin.

**Pirs:** *Hûn li wê derê ji Kurdistanê haydar in, yan na?*  
**Bersiv:** Erê, em deng û bahsên dinyayê guhdarî dikin, bi taybetî ew deng û bahsên ku li ser Kurd û Kurdistanê ne, yan pêwendiya wan li gel Kurdistanê hene. Her wisa em gelekî kêfxweş dibin ku navê Kurdan ji radyoyê dibihîzin û di rojnaman de dixwînin. Me pê xweş e, ku em li çawariya Kurdan baştir agahdar bin.

**Pirs:** *Karê pişka mezin a Kurdên Belûcistanê çî ye?*  
**Bersiv:** Pişka mezin a Kurdên wê derê werzkar (cotkar) û terşdar û dikandar in. Serokhêz jî piraniya wan di karê dewletê de ne, yan jî kargehdar in û mijûlî dad û bistedê (kirin û firotinê) ne.

**Pirs:** *Karê pişka mezin a Kurdên Belûcistanê çî ye?*  
**Bersiv:** Pişka mezin a Kurdên wê derê werzkar (cotkar) û terşdar û dikandar in. Serokhêz jî piraniya wan di karê dewletê de ne, yan jî kargehdar in û mijûlî dad û bistedê (kirin û firotinê) ne.

**Pirs:** *Karê pişka mezin a Kurdên Belûcistanê çî ye?*  
**Bersiv:** Pişka mezin a Kurdên wê derê werzkar (cotkar) û terşdar û dikandar in. Serokhêz jî piraniya wan di karê dewletê de ne, yan jî kargehdar in û mijûlî dad û bistedê (kirin û firotinê) ne.

**Pirs:** *Karê pişka mezin a Kurdên Belûcistanê çî ye?*  
**Bersiv:** Pişka mezin a Kurdên wê derê werzkar (cotkar) û terşdar û dikandar in. Serokhêz jî piraniya wan di karê dewletê de ne, yan jî kargehdar in û mijûlî dad û bistedê (kirin û firotinê) ne.

**Pirs:** *Karê pişka mezin a Kurdên Belûcistanê çî ye?*  
**Bersiv:** Pişka mezin a Kurdên wê derê werzkar (cotkar) û terşdar û dikandar in. Serokhêz jî piraniya wan di karê dewletê de ne, yan jî kargehdar in û mijûlî dad û bistedê (kirin û firotinê) ne.

**Pirs:** *Karê pişka mezin a Kurdên Belûcistanê çî ye?*  
**Bersiv:** Pişka mezin a Kurdên wê derê werzkar (cotkar) û terşdar û dikandar in. Serokhêz jî piraniya wan di karê dewletê de ne, yan jî kargehdar in û mijûlî dad û bistedê (kirin û firotinê) ne.

**Pirs:** *Karê pişka mezin a Kurdên Belûcistanê çî ye?*  
**Bersiv:** Pişka mezin a Kurdên wê derê werzkar (cotkar) û terşdar û dikandar in. Serokhêz jî piraniya wan di karê dewletê de ne, yan jî kargehdar in û mijûlî dad û bistedê (kirin û firotinê) ne.

**Bersiv:** Hejmara Kurdên Biraxoyî milyon û nîvek dibe, ku li Îranê, Iraqê, Afganistanê, Hindistanê û Pakistanê akincî ne. Ji wan nêzikî bîst hezar kesî li Afganistanê dijîn.

**Pirs:** *Erê te bahsa Kurdên Hindistanê kir, hejmara wan çend e?*

**Bersiv:** Ez hejmara wan baş nizanîm, lê şih sal berî nuha ez çûbûm Hindistanê bajarê Panîbet. Li wê derê, li gel biraderekî Hindî ketim xebirdanê. Ji min pirsî ku ez xelkê ku derê me: Min got ez Kurdê Kwêteya Pakistanê me. Hema rabû wî alî wî alî rûyê min ramûsa û got ez jî Kurd im. Ji min daxwaz kir ku bibim mêvanê wî. Min daxwaza wî pejirand û em tev de çûn gundê wan.

Hemû Kurd bûn. Gundê wan nêzikî bajarê Panîbetê bû. Bi şevê, xelkê gund hemû li mala wî berev bûn. Ewî ez bi xelkê nasandim. Xelk gelek kêfxweş bûn. Min jî behsa Kurdan ji wan re kir.

**Pirs:** *Li Belûcistanê, kan û binekan (dewlemendiya sererd û bînerd) çî heye?*

**Bersiv:** Li Belûcistanê hulma xweristî (gaza tebîî), rejûber (komira kevirîn), kevirê mermerê ku baştirîn mermerê Pakistanê ye, cewahirat asin, mis: her wisa mezintirîn çala hulmî ku di erdê Kurdekî da derketiye hene. Çun dewlet nagîje çawaniya Belûcistanê û lê mêze nake û heyî û samana (serweta) wê pûr (talan) dike, her tim alozî di navbera Belûcistan û Pakistanê da çêdibe.

**Pirs:** *Niha çend hizb li Belûcistanê xebatê dikin?*

**Bersiv:** Hizbên serekî yê Belûcistanê eve ne: 1- Cemiyeta Alimên Îslamî ya Belûcistanê; 2- Naşral Partî; 2-Ewami Naşînal Partî. Di nav van hizb û sazûmanan da Kurd û Belûc bi hev ra xebatê dikin.

**Pirs:** *We pê xweş e ku hûn rojekê vegerin Kurdistanê?*

**Bersiv:** Erê, awat û arezuya me hemûyan e ku em rojekê bizivirin nav hev xûn û hevzimanên xwe yê Kurd û di azadî û serbestiyê de bijîn.

**Pirs:** *Hûn gelekî navê Merdûxî didin, gelo te tarîxa Merdûxî xwendiyê?*

**Bersiv:** Erê, ez Merdûxî mezintirîn mêtûnivîsê Kurd dizanim û hemû carê bi navê profesorê Kurd navê wî ûnim.

**Pirs:** *Gelo hûn dizanin ku hûn kengî hatine Belûcistanê?*


**Bersiv:** Heta cîhê ku ez dizanim Kurdên Belûcistanê di zemanê Enûşîrewan da ji bajarê Helebê hatine Pakistanê.

**Weşanên Nuh**


Amadekar: Rohat

**Gulbijêreke Navên Kurdî,** Fexredîn, Weşanxana Sara, 93 rûpel, Stockholm, 1990

Di wê berevokê de navên keçan, navên kuran angorî rêza alfabetîk hem bi Zaravê Kurmancî, hem jî bi zaravê Soranî cîh girtine. Di destpêka pirtûkê de pêşgotîneke Dara Osman û bi navê "Pêşgotîneke Pêwîst" nivîseke mayîn ji aliyê nivîskar hatiye nivîsin. Di nav rûpelên wê xebatê de ferhengokekê jî cîh girtiye, di beşa çavkaniyan de çawa em fêr dibin ku, cara pêşîn derheqa navên Kurdî de xebateke pêşîn ji aliyê Giw Mukriyanî di sala 1961'an li Hewlêrê bi navê "Nawî Kiç û Kurani Kurdî" hatiye weşîn.



**Navên Kurdî,** Amed Tigris, Weşanxana Apec-Tryck, 84 rûpel, Stockholm, 1990.



Di nav rûpelên wê berevokê de 1554 navên keçan û 1185 navên lawan cîh girtiye. Ji der navên Kurmancî, hin navên zaravên mayîn jî wek **Soranî, Dimilî û Hewramanî** jî, di pirtûkê de hene; bi tîpên **S, D, H,** hatine nişandan li hemberî hin naman manayên wan jî hatine nivîsin. Nivîskar di pêşgotina xwe de li ser çend pirsên naman disekine û bi pêşketin û ramanên netewî guherîna naman, bandûra kesnama (nasnama) netewî li ser naman şîro vedike.

**Navên Kurdî / Kurdische Namen,** A. Balî, 72 rûpel, Weşanxana KOMKAR, Köln, 1990.

Pirtûk, bi pêşgotîneke weşanxanê dest pê dike (bi sê zimanan: Kurdî, Tirkî, Almanî) û paşê pêşgotîneke nivîskar bi xwe tê, li dû van pêşgotinan, nivîseke Dr. Ferhat İbrahim di pirtûkê de cîh girtiye, ew di Unîversîta Berlînê de kar dike. Piştî rêzkirina navên keçikan û lawikan, di dawiya pirtûkê de ferhengokekê jî cîh girtiye. Di qapaxa rûpelên dawîn de dokumenteke ku ji aliyê sefaretê Tirkîyê de hatiye amade kirin, heye, di dokumentê de tê diyar kirin ku, hemwelatîyên Tirkîyê navlêkirinên Kurdî re destûrê nade, gelek dijwariyan diafirîne.




**Bi Kurdî Navên Mirovan,** Yusuf Kaynak, 88 rûpel, Weşanxana Doz, İstebol, 1991.

Ev cara pêşîn e ku pirtûkeke navên Kurdî li Tirkîyê tê weşandin. Ji der pêşgotina weşanxanê, pêşgotîneke ku nivîskar li Lhayê amade kiriye, di destpêka pirtûkê de cîh girtine. Di rûpelên 13-52'an de ji navên lawan hene.

**Navên Kurdî, Kurdische Namen,** Kürt İsimleri, Hüseyin Kartal, 418 rûpel, Weşanên Kurdistan, Os-nabrück, 1992.

Ev xebata, angorî pirtûkên li jorê pirtûka here firehtir e. Pirtûk bi pêşgotîneke Kurdî û Tirkî dest pê dike. Paşê bi zimanê Almanî destpêkek heye. Nivîskar berî ku derbasî jinenav û mênawan bibe, dîr û dirêj li ser bingeha hin pey û naman disekine, bi çavekî etîmolojîk koka van peyvên vedike. Di navbera rûpelên 131-403 de bi hezaran navên jin û mênawan hatine rêz kirin. Di dawiya pirtûkê de pêşgotîneke ku ji aliyê Lütfü Ball, kaya bi zaravê Dimilî hatiye nivîsin, cîh girtiye. Di pirtûkê de mirov dikare rastî hemû navên Kurdî bêt, wek mîsal navên keçan yê ku tenê bi "yek"ê ve dest pê dikin, hejmara wan giştîyê 65'an.



## Roşan BARİÇEK

Cay karê ma di 'edet o, ma aşmî (mengi) di yew ray (fini, gi-langi) kom benî, qalê karî kenî, ge-ge zî teriqnenî (suhbet kenî). Çend rojî ra ver cay karî di ma rayna (fina) kom bî (amey pêser). Grûba karê ma di welatanê ciyacyayan ra mêrdimî estî. Serekê grûbi, yew Swêdî (Îsweçij) yo. Qali amey qali, grûbi ra yew cenîya Hong-Kongiji behsê roşananê welatê xwi kerd. Cenêki kişta min a raştî di ronîştî bî, gama ki mi a gûşdarîtnî mi xwi hetî (xwi pîze di) va "Eke ez bişîna (bişîya) ez do (ko) qalanê yay binusa". Bi aw (ay) nîyet mi hîna weş bala xwi day qalanê yay ser. Labelê sewbî embazî dekwî qalan miyan, qalîkerdişê cenêka Hong-Kongiji zaf nêramit. Kombiyayîna (toplantî) ma ki qediyay, ez derheqê 'erf û 'edetane Hong-Kongî di sewbî çîyan cenêka Hong-Kongiji ra persaya û mi nuştî. Xeyr û gune ya rî, ya çî va mi ay nuşt.

Namey na cenêki Ha Pîng o. Verî ma tikê (biney) Hong-Kongî bişinasnî, dim a tikê Ha Pîngî, dim a zî 'edetane yîni:

Hong-Kong, hima zî kolonîya (sömürge) İngilîzan o û o do (ko) hetanî serra 1997 yîni dest di bimano. 1997 di İngilîzî do (ko) fek ti ra verra dî û bidî Cumhuriyetê Şarî yê Çînî (Çin Halk Cumhuriyeti).

Ha Pîngî, 1957 di Hong-Kong di marda xwi ra biya. Piyê (baw-kê) ya, nizdî Nankîn ra şarîstane Çan-Şû (eke mi şaş nênuşt!) y ra yo. No şarîstane rojhelatê Cumhuriyetê Şarî yê Çînî di yo. Meslegê piyê Ha Pîngî casusey biya. Ha Pîngî ki meslegê piyê xwi vana, ez xwi hetî vana "Nêbo ki ez şaş fam bika?", ez newe ra ti ra persena, a hiwena û bi Swêdkî vana "spion" (casus). Ez xwi pîze di vana mi caran nêdîyo ki yewî vato "Piyê mi casus o". Piyê yay anti-komunist biyo, vera (karşî) Cumhuriyetê Şarî yê Çînî casusey Taywan (Formosa) i kerda, yanî hesabê Taywanî ser o xebitîyawo. Semedo ki karê yê zaf biyo, piyê yay zaf nêamewo keye. Aşmî di yew-di ray. Demewo ki ya 7-8 serra biya, piyê yay merdo. Aw semed ra zî Ha-Pîngî mirda xwi piyê xwi nêdîyo.

Maya yay, şarîstane Kantonî ra ya. No şarîstane zî rojhelatê Cumhuriyetê Şarî yê Çînî di yo. Meslegê mara (maya) yay mu'alimey biya, hetî ra zî neqş kerdo, tef û talê xemlî (sûs eşyasî) û çiyê enasarênî viraştî.

Hîrê biray Ha Pîngî estî. Yew ya ra şenikêr (wirdiyêr) o, di hebî zî ya ra pîlêr î.

Ziwanê pêrdê yay Mandarînkî (Mandarînkî) biyo. Mandarînkî, ziwanê resmî yê Çînî yo. Dîne yê zî "Fa" biyo. Hewawo ki Ha Pîngî vana, "Fa" ziwanê Mandarînkî di namey Bûdîzmî yo. Yanî Çînîjî nêvanî Bûdîzm, vanî "Fa". Eke mi şaş fam nêkerd, "Fa", Bûda bi xwi yo zî.

Ziwanê maray yay Kantonkî yo. No ziwan zî ziwanê resmî yê Hong-Hongî yo.

Ha Pîngî hem ziwanê mara xwi hem zî ziwanê pêrdê xwi zana. Hewawo ki a vana, Mandarînkî û Kantonkî pê nêmanenî. Vana "Çîn di nizdî 40 hebî ziwanê ciya-ciyay estî".

# CENÎYÊKA HONG-KONGIJÎ VA, MÎ NUŞT

Hong-Kong di gede demewo ki hîrê serre yo dest bi mektebê pitikan (anaokulu) keno, gama ki panc serre yo dest bi mektebê verînî (ilkokul) keno. Mektebo verîn şaş serrî, mektebo miyanî 3 serrî, lîse 3 serrî ya.

Ha Pîngî lise ra pey şîya enstîtuya mu'aliman. Na enstîtuy 3 serrî ya labelê Ha Pîngî te de di serrî wendo, nêqedênaya; çimkî mêrde kerdo, yew lajekê Hong-

Vêki (veyeki) cilanê (kincanê) suran xwi ra dana.

Camêrd yew ray zewiciyêno. Vanî wexto verên di, yanî çend sey serrî ra ver, camêrdê ki yîni rê gede nêbinî, di ray zewiciyaynî labelê ewro çî kes di ray nêzewiciyêno.

## Merg

Hong-Kong di merdî (meytî) dekenî tabutî û yê tabutî reydi de-



Kongijî reydi zewiciyaya û ameya Swêd.

Verî mêrdey Ha Pîngî amewo Swêd, dim a zî 1978 di a ameya. Aw wext ra Swêd di ya. Nika Stockholm di manena. May yay û biray yay Hong-Kong di yî. Cuwe ra ge-ge şona Hong-Kong yena. Mesela par şîya ageyrawa.

## 'EDETANÊ HONG-KONGIJAN RA

### Marda xwi ra biyayiş

Nameyê gedan, zafane (vêşane) verî biyayişê yîni pa niyêno. Ma û piyê gedan nameyê gedanê xwi pa nanî. Ge-ge zî bawkalê (kalikê) gedan yan zî yewna pîlê keyî nameyê yîni pa nano.

Marda xwi ra biyayişê gedi/geda ra pey yew aşmî ki viyarti, maya yê/ya hakan sur kena, girêna, dana mêrdimanê xwi û nas û dostanê xwi. Yê nê hakan wenî û yê zî hedîyeyan danî maya gedi/geda.

Hong-Kongijî hîna zaf wazenî ki yîni rî laj bibo.

### Zewac

Çend sey serrî ra ver Hong-Kong di may û pi qerar daynî ki lajê yîni û keyney yîni kamî reydi bizewicî labelê ewro (eyro) laj yan zî keyna bi xwi qerarê xwi danî, bi zer ba xwi zewiciyênî.

Semedê zewacî ra veyve ronani. Key (aileya) lajekî, nas û dostan da'wet kenî veyve û werd (wer) danî bede (bere). Ayê ki wezîyetê yîniyo ekonomîk baş bo teber a (aşxane di) werdê veyvî danî, ayê ki feqîrî bi keye di danî.

kenî tirbi. Serranê peyanan di semedo ki şarîstane di ca nêmendo ki tirban bikenî û merdeyan dekî, vêşane (ekserîya) merdî û tabuta yê/ya piya veşnenî, wayîrê merdî wela yê xwi rê nimnenî. 'Edetê veşnayişê merdeyan verî Hong-Kong di çînêbiyo. Labelê tanî welatan di no 'edet verîna esto. Mesela vatişê Ha Pîngî gore, Tayland di verîna merdeyan veşnenî.

Hewawo ki ya vana, yew ray se (ze) turist şîya Tayland, weyra tikê menda. Yew ray zî şîya Cumhuriyetê Şarî yê Çînî (Çin Halk Cumhuriyeti). Vana "Şarê Çînî zaf feqîr o, wezîyetê yîniyo ekonomîk hewl niyo." Vatişê yay gore, Çînîjî hima zî dîndar î û yîni hima fek 'erf û 'edetane xwi yê verênan ra verra nêdawo.

## HONG-KONG DÎ ROŞANÎ

Çar roşanê Hong-Kongijan estî.

### I)Roşanê "Sann Linn"î

Me'na "sann"î ziwanê yîni di "newe", me'na "linn"î zî serr a. "Sann Linn" beno sernewe yan zî serra newa.

Serneweyê yîni nizdî ortey aşma sebatî (şubat) di dest pey keno. No roşan hewt rojî rameno. Roşanê "Sann Linn"î di şar şono mêrdiman û dostanê xwi der maneno (ziyaret keno), gedey (domanî) keyf û şayî kenî, abiasan roşan pîroz (imbarkên) beno.

Teqwîmê yîni di zî 12 aşmî estî labelê tanî aşmî di heb î. Mesela şîno (mumkun o) ki di aşmê

sebatî bibî (na mesela mi rê îzeh kerdi labelê mi fam nêkerdi).

### II)Roşanê "Tün İmm Çi"

No roşan 15'ê aşma Gulani di yo. Tena rojêk (yew roj) o. Yew werdo (wero) xusûsî esto ki nê roşanî di virazenî, wenî. No werd, riz, goştê kargî (kergi) û nan ra viraziyêno.

No roşan ki ame, ganî mêrdim xwi bişuwo û pak (pank) bo.

Sembolê nê roşanî huweyê qeyek (kayık küreği) o.

Vatişan gore, yew wext yew xorto zaf aqilî û jêhatî biyo, padişahî no xort welat ra teber kerdo. Xort zî rojêk yew qeyeki wenîştî, deryay (dengizî) ser ra şîyo û hinî caran nêageyrawo.

Wextê verînî di şarî no werd viraştîni û devistîni derya ki aw (ay) xort nêxeniyo û maseyê deryay nê werdî biwerî, xortî nêwerî. No roşan bi xwi na mesela ra pey biyo 'edet. Labelê anka (inka) hinî şar werdê xwi nêzereno derya, yê weno.

### III)Roşanê "Çon Çauw Çi"

No roşan 15'ê aşma Agustosi di yo. Mesela nê roşanî zî wina ya:

Vanî wextê di yew padişaya -yan zî yew Hûmay- biyo, aşmî ra (aşmî ser o) biyo. Rojan ra yew roj keyna nê Padişay dawo piro aşmî ra ameya ridê 'ardan ser. Yanî ameya dinya ma. U keyneki dinya di yew dewijo citêr diyo, a u citêrî zerrî devista yewbînan, yewbînan ra hes kerdo, zewiciyay. Zaf zeman te de nêşîyo, dey rî gedey biy. Labelê senê ki Padişaya pey hesiyawo ki keyna yê şîya dinya di mêrde kerdo, him zî yew citêr giroto, zaf hêrs biyo. Emir dawo virsoyan (virsikan) ki bêrî keyna yê dinya ra berî. Aya ser ra hima ca di hewrî gurray, virsoy akewtî (virsikî virsay) u amey keyna Padişay girota apey berda aşmî ser, teslîmê pêrdê yay kerda. Aw roj ra pey keyneki aşmî di menda, mêrdey ya u gedey ya zî dinya di. Piyê ya serrî di tena yew roj musa'de keno ki a bêro dinya di gedanê xwi u mêrdeyê xwi ziyaret biko. Aw roj zî 15'ê aşma Agustos o. Aw semed ra aw roj şar roşan keno, keyf keno. Rojê roşanê "Çon Çauw Çi" di gedey çilayan u findan (mûman) pa nanî, teber a geyrenî.

Nê roşanî di yew werdo şîrino xusûsî viraziyêno u weriyêno.

### IV) Roşanê "Çong Yon Çi"

No roşan 9'ê aşma Eyluli di yo u roşanê merdeyan o, yanî qaydê merdeyan rê pîroz beno. Rojê roşanî, şar meywe u -eke bişîni, yanî eke perey yîni bibî- yew xozî erînenî, goştê yê sur kenî, benî tirba merdeyanê xwi ser, keye u kulfet piya wenî. Tirba merdî ser o findan pa nanî, du'ayan kenî, Hûmay xwi ra çiyaneşan wazenî.

Hetî ra zî vêşane gedey (ge-ge zî mêrdimê pîlî), rojê roşanî mêr-

dimanê xwi yê merdeyan rê tewir-tewir hedîyeyan hazir kenî yan zî erînenî u veşnenî. Ê bawer kenî ki nê hedîyeyê ki yîni veşnay, a dîna di merdî resenî u merde nê hedîyeyan ra îstîfade keno. Nê hedîyey sembolîk î. Mesela, qaydê merdî rê peran veşnenî labelê peranê raştikênan nê, peranê qestikênan (sexteyan) ê sembolîkan. Bawerîya yîni gore, pereyê ki veşnay pereyê raştikêni nêbî zî a dîna di pereyê raştikêni kewenî merdî dest. Yan zî eke yew ban (bano qestikên, maketê banî) veşnawo, a dîna di banêdo raştikên keweno merdî dest. Mêrdim şîno nê hedîyeyan tirba merdeyan ser o zî veşno, keye di zî veşno. Şar qaydê merdî rê roşanê "Çong Yon Çi" di tena hedîyeyan nêveşneno, ge-ge rojanê bînan di zî veşneno. Mêrdim şîno (eşkeno) yewerî ver a zî hedîyeyan veşno. Ha Pîngî vana "Ez anka Hong-Kong di niya, maya mi herinda mi di hedîyeyan erînenê, mi ver a qaydê pêrdê mi rê veşnena."

Ez xwi hetî vana "Seki Bisilmaney (Muslumanî) peyniya aşma remezanî di fitri danî." Ez zî zana, anka dewi di ma u piyê mi zî hergû serrî mi ver a fitri danî.

Nuştîşê qalanê Ha Pîngî ra pey, ez xwi bi xwi vana "Sey vêşaneyê multeciyan mi zî na multeciye di, Swêd (Îsveç) u Frensa di mêrdimê tewir-tewir welatan dî. Kûrsanê ziwani di u cay karî di ma piya bî. Ge-ge yew bîna di yan zî yew keye di ma piya mendî. Werrekîna (Kaşka) derheqê 'erf u 'edetane yîni (jîni) di ez yîni ra bipersaynî u mi vatişê yîni zî binuştîni."

## YEW BEYTA MIRÎDANÊ ŞÊX SELAHEDDÎNÊ ŞÊX SE'ÎDÎ

Arêkerdax: HARÛN

Gelê Kirdo[n] rind bizonî!  
La Ella, heyron Ella!

Axir wext, axir zemon o,  
La Ella, heyron Ella!

Homay bido axret u imono,  
La Ella, qirbon Ella!

Ella bido axret u imono,  
La Ella, dayim Ella!

Homay kerdo qismetî Zazono  
La Ella, qirbon Ella!

Ella kerdo qismetî Zazono  
La Ella, şîrîn Ella!

La Ella, la Ella,  
Ella, Ella, daim Ella!

Ella[w] serî ezma (?) dono  
La Ella, qirbon Ella!

Homay serî ezma dono  
La Ella, qirbon Ella!

La Ella, şîrîn Ella!  
Ellaah! imdat ya

Muhammed Mustafa!

Medet ya Bavê Siddîq!  
İmdad ya Bavê Sido!\*

\*Siddîq (Sido): Lajê Şêx Selaheddîni yo.

\*\*Na beytî yew mirîdê Şêx Selaheddîni vatibî, mi yew band (kaset) ra vengê yê gûşdarît u nuştî. Şêx Selaheddîni, lajê Şêx Se'îdî yo (Şêx Se'îdî ki 1925 di İdarekerdaxanê Tirkiya Diyarbekir di dar de kerdi).



Medrese-i Ala-Turka

## Xaçepîrs

### Amadekar: S. Rêving

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												
11												
12												

**ÇEPERAST** 1-a- Serokwezîrê Kurdistanê Îraqê. 2-a- daçêkek (bervajî) b- Li Kurdistanê Îraqê çemek. c- giyayê ku biharê li hev hatiye ristîn û ji bo alifê pez, ê havînê hatiye hişk kirin. 3-a- roja berî îro, roja çûyî. b- rih, kok c- bi zazakî 'sêv'. 4-a- peyveke pirsê (bervajî) b- nexweşiyek 5-a- lehene b- agir 6-a- bi îstiqarî, tenahî b- dumahî. 7-a- baneşanek ("unlem"ek) b- aletê ku çayê tê de çêdikin. 8-a- heşaretê b- hedef, emel. 9-a- tas, kodik. b- di kîmyayêde sembola zêr. 10-a- hejmarek b- rêzan, rêber. 11- a- Navekî kuran (bervajî) b- esman, 'ez-

man'. 12-a-nû, ne kevin b- ne dereng (bervajî) c- heyvan, maya.

**SEREJÊR** 1-a- teyare, balafir. b- qezayêke Sêr-tê 2-a- duman, duxan (bervajî) b- xwendina herfeke bêdeng c- mam, birê bav. d- aletê ku mi-

### Bersîva hejmarê berê

**Çeperast:** 1- a)Kurdistan, b)Le. 2-a)edO, b)Berx, c)Kew. 3- a)Jî, b)Ri, c)îroL. 4-a)Ma, b)ropsiB. 5- a)Aşvanî, b)Dojeh. 6- a)Neon, b)Re, c)Tî 7- Teşîrê. 8- a)AB, b)Fêkî, c)eroG. 9- a)Hêmin, b)Rovî. 10- a)Wan, b)Keşe. 11- a)Mamirk, b)eN. 12- a)Ûr, b)Ka, c)Ebdalî.

**Serejêr:** 1- a)Keremşah, b)Mû. 2- a)Ud, b)aşE, c- Bêwar. 3- a)Roj, b)voH, c)Mam. 4- a)Îran, b)Finik. 5- a)îB, b)onN, c)Tên, d)Ra. 6- a)Serpîrek, b)Êk. 7- a)Tirs, b)Eşîr. 8- a)Ax, b) iD, c)okeB. 9- a)Îbo, b)Revend. 10- a)Kr., b)Êrîş. 11- a)Leo, b)etsO. 12- a)Ewlehî, b)Ga, c)Mî.

rov cilan pê utî dike. (bervajî) 3-a-qedeh, şîşa çayê (bervajî) b- Peyveke aciziyê. 4-a-hakim b- heywanekî hov. 5-a- ramûsan b- veqetandekê di Kurmancî de. 6-a-di Kurmancî de pronavek b- rû, dém. c- kesê pir dizane, bi aqil. (bervajî) 7- a-Navê giyayekî ku hişk dikin û jin toza wî wek dermanê xweşîkiyê bi kar tinin ku bîna wê pir xweş e. Her weha navê jinan e jî. b- endustrî (bervajî) 8-a- kesê ji qewmê Îraniyên kevin. b- kurtiya peyva 'doktor'. c- sih. 9-a- ji zikê pez û dewaran re tê gotin. b- listikeke Kurdî ku bi 32 berikan tê listin. c- ne nêr. 10-a- hubûbatek ku bi piranî şorba wê tê çêkirin. b- a niha, berî niha. c- organaekê laşê mirov ku mirov pê dibîne. 11- a- Kûçik b- bi Soranî "av". c- ne, nexêr. d- bi Zazakî "na". 12-a- He-diye, xelat. b- Ceşît, babet, textîl.

### Ji listeyên YEKÎTÎ NIŞTÎMANÎ KURDISTANÊ Û PARTIYA ZEHMETKÊŞÊN KURDISTANÊ\*

1- Ebûbekir Hecî Sefer-Dibistana Navîn, 1944, Pênciwin. YNK, 2- Ehmed Ebûbekir Hesên-Doktor, 1951, Bamernê. YNK, 3- Ehmed Tahir Ehmed- Lîse, 1936, Hewlêr. SERBIXWE, 4- Erslan Bayiz Smaîl- Lîse, 1950, Hewlêr. SERBIXWE, 5- Eyed Hacî Namiq- Huqûqnas, 1962, Hewlêr, 6- Perîxan Mehmûd Abdulqadir- Lîse, 19567, Silêmanî. YNK, 7- Celal Cewher Ezîz- Lîse, 1945, Dubis. YNK, 8- Celal Şefîq Elî-Doktor, 1936, Silêmanî. SERBIXWE, 9- Hesên Hemîd Rehîm- Dibistana Destpêkî, 1949, Kerkûk. YNK, 10- Hesên Kanebî Xidir- Huqûqnas, 1924, Raniye. SERBIXWE, 11- Hesên E.Kerîm Zeman- Huqûqnas, 1942, Hewlêr. SERBIXWE, 12- Hesên Ehmed Ebdula- Dib. Navîn, 1954, Gilale. YNK, 13- Husên Arif E.Rehman- Huqûqnas, 1936, Silêmanî. SERBIXWE, 14- Xusrewgul Mihemed- Lîse, 1949, Xaneqîn. YNK, 15- Seîdî Ehmed Mihemed-Lîse, 1949, Hewlêr. YNK, 16- Seîd Elîxan Ebdî- Lîse, 1952, Zaxo. SERBIXWE, 17- Selam Kerîmxan- Lîse, 1961, Sîdekan. SERBIXWE, 18- Sîrwan Mihemed E.Mecîd- Zabit, 1947, Helebçe. YNK, 19- Şewket Hacî Muşîr- Dibistana Navîn, 1948, JHelebçe. YNK, 20- Şêrko Bêkes- Lîse 1940, Silêmanî. SERBIXWE, 21- Selehedîn E. Hemîd Ebdula- Lîse, 1956, Kifrî. SERBIXWE, 22- Selehedîn Mihemed Hesên-Doktor, 1934, Silêmanî. SERBIXWE, 23- Taha Mihemed Taha- Zanayê Dînî, 1924, Hewlêr. SERBIXWE, 24- Tariq Mihemed Seîd- Mamoste, 1948, Hewlêr. SERBIXWE, 25- Ebdula Resûl Elî- Dib. Zîreçê, 1952, Hewlêr. YNK, 26- Ebdula Hacî Brahmî- Dib. Navîn, 1950, Qeladizê. YNK, 27- E.Xaliq Mihemed Reşîd- Dib. Sin'etê, 1941 Kerkûk, PZK, 28- E.Kerîm Kakeheme E.Kerîm- Lîse, 1949, Şedele. YNK, 29- Elî Ebdulla Ehmed- Lîse, 1953, Kifrî. YNK, 30- Elî Resûl Rustem- lîse 1941, Hewlêr. SERBIXWE, 31- Umer Seîd Elî Hesên- Mamoste, 1945, Silêmanî. YNK, 32- Umer Ebdula Mihemed- Zabit, 1947, Silêmanî. YNK, 33- Qedir Ezîz Hemedemîn- Dib. Navîn, 1954, Hewlêr. PZK, 34- Qadir Mamend Babekiraxa- Dib. Navîn, 1942, Qeladizê. YNK, 35- Kemal Brahmî Ferec- Lîse, 1941, Silêmanî. YNK, 36- Kemal Celal Xerîb- Lîse, 1929, Silêmanî. SERBIXWE, 37- Kemal E.Kerîm Mihemed- Doktor, 1932, Silêmanî. YNK, 38- Gelawêj E.Cebar MecîdO Mamoste, 1954, Kerkûk. YNK, 39- Mihemed Emîn E.Hekîm- Zanayê Dînî, 1947, Çemçemal. SERBIXWE, 40- Mihemed Tewfîq Hemerehîm- Lîse, 1953, Silêmanî. YNK, 41- Mihemed Fuad Mehsum- Doktor, 1938, Koysinceq. YNK, 42- Mihemed Fazil Mihemed- Doktor, 1943, Silêmanî. YNK, 43- Mustafa Qadir Mustafa- Enstituya Zîreçê- 1958, Qeladizê. YNK, 44- Muzhir Elî Mustafa- Lîse, 1956, Hewlêr, SERBIXWE, 45- Izedîn Mustafa Resûl- Doktor, 1934, Silêmanî. SERBIXWE, 46- Noşîrwan Fuad M'erûf- Zabit, 1941, Silêmanî. YNK, 47- Necmedîn Ezîz Smaîl- Telebê Unîversîtê, 1949, Silêmanî. PZK, 48- Nejad Ehmed Ezîz Axa- Lîse, 1927, Silêmanî. SERBIXWE, 49- Nehle Mihemed Sedulla- Lîse, 1957, Hewlêr. Serbixwe, 50- Hêro Îbrahmî Ehmed- Lîse, 1948, Silêmanî. YNK

\* Ji listeyên Partiya Demokrat a Kurdistanê û ji yên Yekîti Niştîmanî Kurdistanê kesên serbixwe jî namzediya xwe danibûn.

### Ji listeyên PARTIYA DEMOKRAT A KURDISTANA ÎRAQÊ\*

1- Îbrahmî Seîd Muhemed- Muhendis, 1945, Dihok. SERBIXWE, 2- Idrîs Hadî Salih- Mamostê Unîversîte, 1952, Hewlêr. SERBIXWE, 3- Azad Fetah Reşîd- Zabit (teqawud), 1944, Hewlêr. SERBIXWE, 4- Ehmed Salar Ebdulwahid- Hunermend, 1947, Silêmanî. SERBIXWE, 5- Ehmed Elî Umer- Ebûqat, 1957, Dihok. SERBIXWE, 6- Ekber Heyder Mûsa- Kadroyê PDKÎ, 1941, Xaneqîn., 7- Ekrem Izzet Necîb- Ebûqat, 1930, Silêmanî. SERBIXWE, 8- Barzan Xakid Ezîz-Spîker, 1945, Hewlêr, 9- Cefêr Şêx Elî Ebdulezîz- Muhendis, 1949, Silêmanî. SERBIXWE, 10- Cemîl Ebdî Sindî- Ekonom, 1952, Dihok. SERBIXWE, 11- Cewher Ehmed Şawaz- Ebûqat, 1956, Kerkûk. SERBIXWE, 12- Cewher Namiq Salim- Ekonom, 1946, Kerkûk, 13- Hesên Husên Befrî- Doktor, 1952, Silêmanî. SERBIXWE, 14- Hemeneçîm Hemeferrec Caf- Doktor, 1946. SERBIXWE, 15- Hemîd Selîm Mîran- Muhendis, 1939, Silêmanî. SERBIXWE, 16- Xeyrî Seîd Elî Beg Yezîdî- Mezîne dînî, 1939, Mûsil. SERBIXWE, 17- Roj Nûrî Şawês- Muhendis, 1946, Silêmanî, 18- Seîd Muhemed Seîd Hirûrî- Ebûqat, 1943. SERBIXWE, 19- Sefer Muhemed Husên Doskî- Hakim, 1949, Dihok. SERBIXWE, 20- Selîm Elî - Mamostê Unîversîte, 1943, Dihok. SERBIXWE, 21- Şefîqe Feqî Ebdula - Mamoste, 1954, Silêmanî. SERBIXWE, 22- Şîrwan Nasîh Heyderî- Ebûqat, 1945, Hewlêr. SERBIXWE, 23- Telhe Seîd Qerenî- Îmam û Xetîb, 1930, Hewlêr. SERBIXWE, 24- Selehedîn Îbrahmî Delo- Kadroyê PDKÎ, 1950, Kerkûk, 25- Ednan Muhemed Husam- Ebûqat, 1938, Hewlêr. SERBIXWE, 26- Efran Osman Husam- Mamoste, 1943, Silêmanî. SERBIXWE, 27- Fazil Ruûf Ceqzî- Kadroyê PDKÎ, 1953, Silêmanî, 28- Ferhan Ebdula Şerefani- Muldkar, 1952, Mûsil. SERBIXWE, 29- Fîret Ehmed Ebdula- Ebûqat, 1946, Dihok. SERBIXWE, 30- Firenso Noma Kanûn Hirorî- Mamoste, 1937 Hewlêr, 31- Felekedîn Sabîr Kakeyî- Nivîskar, 1943, Kerkûk, 32- Fewziye Izedîn Reşîd- Nivîskar, 1953, Kerkûk. SERBIXWE, 33- Qasîm Muhemed Qasîm- Beytar, 1951, Dihok, 34- Qeys Dêwelî Seîd- Huqûqnas, 1957, Dihok. SERBIXWE, 35- Kanebî Ezîz Ehmed Dizeyî- Ebûqat, 1927, Hewlêr. SERBIXWE, 36- Mamûn Nûr Muhemed- Muhendis, 1949, Dihok. SERBIXWE, 37- Şêx Muhsîn Xalid- Îmam û Xetîb, 1957, Silêmanî, SERBIXWE, 38- Muhsîn Salih Kitanî- Cotkar, 1931, Dihok. SERBIXWE, 39- Muhemed Emîn Mewlud- Tucar, 1931, Silêmanî. SERBIXWE, 40- Mela Muhemed Tahir- Îmam û Xetîb, 1947, Kerkûk. SERBIXWE, 41- Muhemed Seîd Ehmed- Ebûqat 1944, Hewlêr. SERBIXWE, 42- Mela Muhemed Şerîf Tahir- Îmam û Xetîb, 1949, Dihok, SERBIXWE, 43- Muhemed Abdulqadir Ehmed- Kadroyê PDKÎ, 1943, Hewlêr, 44- Mele Mehmûd Dêrşewî- Îmam û Xetîb, 1939, Dihok. SERBIXWE, 45- Muhenned Muhemed Emîn- Memur, 1937, Silêmanî. SERBIXWE, 46- Nîhad Nûredîn Reşîd- Ebûqat, 1928, Hewlêr. SERBIXWE, 47- Hadî Xidir Koxa- Esnaf, 1937, Hewlêr. SERBIXWE, 48- Wurya Ehmed Mihemed- Ebûqat, 1943, Hewlêr. SERBIXWE, 49- Yehya Mihemed Ebdulkerîm- Hunermend, 1948 Kerkûk SERBIXWE, 50- Yunis Mihemed Selîm Rojbeyanî- Zabit (teqawid) 1943, Mûsil


\* Ji listeyên Partiya Demokrat a Kurdistanê û ji yên Yekîti Niştîmanî Kurdistanê kesên serbixwe jî namzediya xwe danibûn.

**Ji Listeyên Tevgera Demokratîk a Asûrî;** 1- Yûnadîm Yusif Kenna- Muhendis, 1951, 2- Şîmaîl Nennû Bunyamîn- Muhendis 1959, 3- Fransîs Yusif Şebo- Muhendis, 1951, 4- Ekrem Aşûr Udîş- Mamoste, 1951. **Ji Listeyên Yekgirtî Yên Mesîhiyên Kurdistanê;** 1- Serkîs Axacan Mamendo

# Sîra bi bîhn û sihet

**Şoreş Zîrek**

Di kovar û rojnamên tibbî yên van dawîyan de gelek nivîs li ser sîrê, hatine nivîsandin. Di van kovaran de tê nivîsandin ku sîra xav ji bo sihetê gelek bi feyde ye. Profesor Ake Bruce ku endamê Daîra Serkarîya Xwarin û Jîyanê li Swêdê ye, dîtî û bawerîyên xwe li ser sîra xav weha berpêş dîke: li gor lêkolînên zanyarî yên ku li ser pîrsa tîkîlyên sîrê û sihetê hatine kirin, em gihîştine wê dîtîne ku sîra xav pêşî li hinek cûrên neweşîya kanserê digre. Di serpehatîyên



tibbî de hatiye xuyakirin ku li Çînê ew xelkê ku zêde sîrê dixwin mîna xelkên din ên li Çînê ku kêmbî sîrê dixwin, pîr kêmbî nexweşîya kansera hûr dikevin. Di serpehatîyên tibbî de dîsa xuya dibe ku sîrê kollestrala di nav xwîna de kêmbî dîke û gera xwîna hêsan dîke. Tansiyonê dadixîna û talûka dilrawestane kêmbî dîke. Di hinek lêkolînan de xuya dibe ku di nav sîrê de maddeyek antibîyotîk heye, ew jî pêşî li zekem û hin vîrusan digre. Ji bilî vê, hinek tesîrên sîrê yên nebaş jî hene. Heke mirov zêde sîrê bixwe, di roviyên mirovan de ba(gaz) çêdibe. Ew jî nerehetîyekê di laşê mirovan de peyda dîke. Carna jî, zêde sîrê xwarin di çermê mirovan de guhertinan çêdîke û bîrovên

deq-deqî peyda dibin.

Di bîhna sîra tûj de maddeya "allicin" heye. Bi gumanîyeke girîng dema di maddeya "allicin" de bîhn bête kêmkirin, wê wextê ew maddeya "allicin" jî tesîra xwe wenda dîke. Ji ber vê yekê edî "allicin" li ser gera xwîna tesîrê nake. Loma jî divê sîrê bi terî û xavî bête xwarin. Ew sîrê mîna heban tene firotin, bê tesîr in.

Dîsa Profesor Ake Bruce dîrê li ser pîrsa sîrê di warê derman de radiweste. Di dîroka mirovatîyê de sîrê wek derman hatîye bi karandin. Ew hekim û pîrejînan ku ji nebatan derman çêdikin, di dermanxaneyên wan de cihê sîrê gelek girîng bûye. Bi gelek tecrûbeyan hatîye fêmkirin ku li hember hin nexweşîyên bê çare sîrê wek derman hatîye bi karandin. Di sîrê de kolhîdrad heye, lê di warê vîtamînê de sîrê ne hewqas dewlemend e. Ew maddeyên ku di bîhna sîrê de hene, ew bi xwe di warê tibbî de pîr giranbûha ne. Ew hevtemamkirina maddeyên kîmyayî wek "alium sativum" ku di nav sîrê de heye, sîrê jî wan cûreyên pîvazên din cihê dîke. Ev madde jî li hember nexweşîya astim (bîhnçîkî) jî tê bi karandin.

Gelek kes hene ku ji bîhna sîrê aciz in. Lê "gul bê sinc nabe" û sîrê jî bê bîhn nabe. Çareya bîhna sîrê ew e ku piştî xwarina wê, hinek bexdenos bête cûyîn.

## Kitêbek nû ya Malmîsanij:

### Folklorê Ma ra Çend Nimûney

Dimilî (Zazakî) yek ji zaravên Kurdî yên herî girîng e, zaraveyêkî ku divê em Kurd li ser wî bi giranî rawestin. Bi ya min kovar û rojnameyên me û nivîskarên me pîr cih nadin vî zaraveyî û li ser bi awayê ku pêwîst e nasekinin.

Malmîsanij van mehên dawîyê berhemeke folklorîk a heja, daye çapkirinê. Pirtûk jî alî We-şanên Jîna Nû ve, li Swêdê hatiye belavkirin. Girîngiya vî karî ew e ku devokên Zazakî tê de hatine nîşankirin: Devokên Çermûgê, Çewligê, Dêrsimê, Gêlê, Hênê, Licê, Madenê, Pîranê, Paloyê, Motkî û Siwêregê. Karekî bi vê metodê rê li ber mirov pîr vedike ku lêkolînan li ser çêbîke. Feyda vî karî ne tenê di çarçewa devokên Zazakî de dimîne, feyda wê digihîje devokên Kurmancîya Jorîn û Jêrîn jî. Divê berhemên folklorê Kurdî bi hemû devokên xwe ve bi vî awayî were berevkirin.

Berhemên hin embazên (heval) dinê jî di vê pirtûkê de bi cih bûne, wekî: J. Eşpar û Harun, Nûra Cewarî û Zozan Ozmanî jî notayên gelek stranan nivîsandine.

Pirtûk li van mijaran tê dabêşkirin: deyîr(stran), vatey verînan (gotînan pêşîyan), mertal(têdêrxistinok), zewî(nifir), du'a, estane

(çîrok) û dugotînok (wekî: adir û şewat). Li gor zanîna me, ev yekem berhevoeka giştî ye ku li ser zargotîna Kurdîya Dimilî ronahîyê dibîne. Ferhengê Kurdî ya herî zengîn zargotîna e. Divê bi qasî ku mirov bikare berhemên folklorîk kom bike. A dinê tesîra zimanên biyanî li ser zargotîna hema bêjî nîne. Nivîskarê Kurd pîr çaran di bin tesîra avahîya rêzîmanî ya zimanên biyanî de ye. Ji bo ku mirov xwe jê xelas bike, zargotîna serçavîyeke girîng e.

Ji karekî weha bêhempa re pêşgotînek pêwîst bû.

Malmîsanij di kitêba xwe de pîr gotîna reş nivîsandine. Ravekirina wan gotînan reşkirî giş ne yek in. Eger ew di pêşgotînekê de şîrove bibûna wê baş bûya. Xwedîyê berevokê estaneke bi sê cûreyan par ve kirîye, jê re termên cuda jî danîne: jî estaneke civakî re gotîye "estaneke", jî yên ken re gotîye "meseleyê" û fiqreyê, jî yên hezkirinê re gotîye "hikayeyê heskerdîşî". Em nîzanîna çîma weha parve kirîye. Ev yek jî di pêşgotîna de bihata şîrovekirinê wê rind bûya.

**Amed**

# BEROŞ



Mahmûd Lewendî

## Rê û Rêgayên Menşûrbûyînê

Ger hûn dixwazin nav û dengê we belav bibe û hûn menşûr bibin, aha ji we re çend pend û şret û nesihet:

- 1-Bi xuşk an jî keça yekî meşûr re bizewicin.
- 2-Têkevin partîyekê, piştî şeş mehan îstîfa bikin û bi navê "Çîma Veqetiyam" broşûrekê derxin.
- 3-Li derekê hazîrîya teza doktorayê bikin, ger hûn nikaribin jî divê ku hûn tiştêkî welê bikin daku xelk ji we re bibêje "Doktor".
- 4-Ji her kesî re "Fîlan salê ez û Mehdi Zana" an jî "Ez û İsmail Beşikçi bi hev re di zindanê de bûn" bibêjin.
- 5-Her tim bi çentê James Bond bigerin. Bila di çentê we de jî her tim kitêbên bi îngilîzî, almanî, fransî hebin, ji bo ku di sohbetekê de hûn bikaribin fersendê bibînin û rê yên dora xwe bidin, wekî ku hûn bi wan zîmanan dizanin.
- 6-Di şev, kongre û sêmineran de gava ku derketina we ya der pêwîst be, di ber sahnê re derkevin daku bila her kes we bibîne.
- 7-Di sêmineran de pêwîst be an ne pêwîst be, rabin bi xîfî daku bila xelk bejn û bala we bibîne.
- 8-Bi kesên menşûr û navdar re fotografan bikişînin, piştî re hûn dikarin nîşanî mêvanên xwe bidin an jî di kovar an rojnameyêkê de çap bikin.
- 9-Li welatê ku hûn lê dimînin, ji komelên mehelli bigrin hetta bi kilîse. Xaçê Sor, Pen Klub, bibin endamê hemûyan daku rojekê hûn bikaribin bibêjin "ez endamê fîlan rêxistina me jî".
- 10-Navê kesên meşûr tim nivîso bibêjin, wekî ku hûn wan pîr baş nas dikin. Mesela li şûna ku hûn bibêjin Hikmet Çetin, Nurettin



-Ez dinivîsim ew jî çewtîyên min ên gramatikî rast dîke!

Yilmaz û hwd. bibêjin "wê rojê min bi Huko re xeber da", an jî "Nûro, Salo" û hwd.

11-Demekê bibêjin "min dev ji cixarê berdaye" daku xelk bibêje "Fîlan kes dev ji cixarê berdaye" û bi vî awayî wê behsa we bikin. Lê paşê dîsa dest pê bikin an jî bi dizî bikişînin.

12-Çi nivîs an kitêbek Kurdî derkeve bibêjin "ez nivîskarê wê nas dikim, beriya ku derxista ji min re şand, min kontrol kir".

13-Navê navdarên wek J.J.Rouso, J. P. Sartre, V. Hugo, J. London, Ahmedê Xanî, Mela-yê Cizîrî, Firdewsî, Şîrazî û gelekên din li gel navên berhemên wan ji ber bikin. Di dema suhbet û axaftinan de jî mewzû çî dibe bila bibe, bi navê wan dest pê bikin. Mesela eger behs li ser xwarinê be, bibêjin "Viktor Hugo di kitêbeke xwe de behsa xwarîneke wek vî xwarinê dîke".

Piştî van nesihetan ger nav û dengê we belav nebe wê wextê herin ber dîwarê mizgeftê an jî di kanîyê de birrîn, wê herkes qala we bike.

## DI DERBEKÊ DE 15 NAN

Gundî giş li hev rûniştine. Yekî rîsipî ji gundîyan dipirse:

- Gelo merivek dikare çend nanan bixwe?
- Gundîyekî xort hema xwe diavêje pêş û dibêje:
- Apo, ez dikarim di derbekê de panzdeh nanan bixwim.
- Rîsipî:
- Kuro ez behsa mirovan dikim, ne ku dewar



-Piştî ku dev ji cixarê berda weha lê hat!

## ne karê aqîla ye lê rast e

**Amadekar: Hesen Mizgîn**

■ Ewr jî dilopên piçûk ên ji avê, yan jî ji qeşa krîstal ku bi buxara avê ya di hewayê de peyda dibin, pêk tê. Di mêtro kûbeke ewrê kumulus de nêzî 50 mîlyon dilopên avê hene û çapa dilopekê nêzî 0.01 mm. ye.

■ Alimên Fransî bi keştiyeke asîmanî ya Rûsî re dê di sala 1996'an de balonek bişînin Marşê. Balon wê di rojekê de nêzî 100 km bifire û heya nêzî 100 rojan wê resimên erdê Marşê bişîne dinê. Balon wê di nava rojê de bifire, lê bi şev wê di ciyê xwe de raweste.

■ Teknîsyenên şirketa Hewlett-Packard li DYAyê saetek nû çêkirine. Ev saet di 1.6 mîlyon salî de saniyekê bi pêş yan jî paşde diçe.

■ Li gor lêkolîneke nû insan ji tiştê ku dixwîne %10, ji tiştê ku dibihîze %20, ji tiştê ku dibîne %30 û ji tiştê ku hem dibîne û hem jî dibihîze %70 bi birtîne.

■ Bi îxtiyarbûnê hemû hisên me zeif dikevin. Sebeba vê yekê wendabûna hucreyên sinîr e.

■ Japonî bi sistemeke nû ya datayê dikarin resmê zarokê hêj di zikê diya xwe de ye, texmîn bikin. Data bi rehetî resmê zarokê wê di 7 saliya xwe de çawa be, derdixe holê. Data jî resmên dê û bavê hereket dîke.

■ Li gor lêkolîneke insanên dirêj ji insanên kurt biaqiltir in.